PIRS Kovareke Rewşenbîrî Serbixwe ye

Naverok

- **Pêşgotin** …… 2
- **Gotar û Lêkolîn**:
  - Mihemed Uzun ji nav ne barkir..... Mistefa Henan 3
  - Barzanî li Rûsya.....Dr.Mihemed Zêno 6
- **Hevpeyvîn:** Di gel Merwan Berkat..…… Pertewê Şerqî 13
- **Wêje**:
  - Vekolîn:
    - Mem û Zîn3/4 …… Rizgar Kurdaxî 18
    - Marie Luise Kaschnitz ……..…. Tengezarê Marînî 23
  - Helbest:
    - Diçim paleya stêran..……..... Durust 27
    - Yara devliken ……..... Nûşîn bêcirmanî 28
    - De were .....…… Mûrûvet Cacim 29
  - Çêrok:
    - Keçên Pîrê …….. Rezo 30
    - Roviyê Dekban (werger ji Rûsî) .....… Mistafa Henan 33
- **Xwenasîn**:
  - Bajarê Efrînê…….....…….Dr.M.Elî 37
- **Pirtûkxana Kurdî**
  - Pirtûkek Samî Tan…… Merwan Berekat 42
- Gotarek: Nivîsandin ..... Zamdarê Zindî 44
- **Namey û daxyaî:**
  - Çalakiyên desteya birêvebir ..……..…... 48

www.kovarapirs@yahoo.com ..... Buha 50 L.S

www.arsivakurdi.org

Xwendevanê hêja ...

Gava ku nivîskar, hunermend… berheman dide, dixwaze di riya wan re raman, nêrîn, bawerî, hest û helwestên xwe li derbarî tiştekî yan mijarekê diyar bike û derdora xwe bide xuyankirin. Ew li ber wê hêviyê ye, ku kesên din pê agahdar bibin, hikarî lê bibe û hevalan ji bawerî û hestên xwe re peyda bike.

Ew jî mafê her merovekî ye, çi nivîskar, çi stranbêj, çi wênekêş …û hwd. Ji ber ku her yek ji me di dil de heye, û belkî pêwîst jî dibîne, ku raman û karên xwe yên rind bigihîne ferehtirîn beş ji civakê û bi wan bide nasîn.

Nivîsandin bi xwe jî, şêweyek ji gihandina ramana ye, lê ew jî kar û şêweyekî ne hêsan e û wilo ji ber xwe ne tê. Ta ku nivîskar tiştekî yan ramanekê bike hevok û daxe ser rûpelê, ji bilî behrekê, gelek amadekarî û westaneke dûr û dirêj jêre gerek e.

Lê belê, digel ku tikes nabêje dewê min tirş e, ne her yekî ku du tîp rêzkirin kane tiştên bi sûd û bi şêweyekî xweşik bafirîne, û bibe nivîskar.

Lê kî kane berhemên afrandar ji nav yên normal vebjêre, û bêje: Ev e nivîskar, û asta wî jî xuyan bike? Yanê pîvana berhemên nivîskar di destê kê de ye?.

Bêguman, ew kes xwendevan e û bi taybetî rexnevan e, ew barê giran ustubariya wan e. Piştî ku berhemên nivîskaran di bin çavên wan re derbas dibine, ew kanin wan binirxînin û asta her yekî destnîşan bikin.

Lê belê, eger xwendevan lawaz be û rexnevan jî qels be, wekî di rewşa me Kurdî de li Sûryê, di warê rewşenbîriyê û wêje de pirsgirêkên mezin peyda dibin. Wê hingê, warê nivîsîn û nivîskariyê dibe bazareke xirab, bazarvanî tiştê xwe lê datîne, lê bazirganê zîrek nînin, ji ber wê jî, ceh û genim ji ser hev netên der, tayî hev dibin, û bi ser xudiyan de dimînin. Û li dawiyê hemî alî bi hevre, bi zirar vedigerin.

Rewşa kesên ku bi Kurdî dinivîsin, wek rewşa wî bazirvanî ye, bi dilekî geş berhemên xwe dadixin bazarê, lê zor mixabin ne xwendevan û ne rexnevan nabêjin win çi difroşin, lewre em nizanin çawa xwe nas bikin û xwe bidin nasîn, ceh û genimê me hemî tên perakî û em xemgîn dibin û pir bi dilsarî vedigerin ser rûpelên xwe.

Lê, her hêviya me li cî ye, ku di paşerojê de, nifşên me yên bên dê ji me bêtir li ziman, çand û kelepûra gelê xwe xwedî derkrvin, bi awireke rexneyî, bi pîvanên zanistî li berhemên nivîskarên xwe vegerin û wan binirxînin. **Desteya birêvebir**

www.arsivakurdi.org

Mihemed Uzun ji nav me barkir
1953—11-10-2007

Careke din qederê Perda xwe ya reş û tarî, bi ser ezmanê welêt de berda, careke din şînê û xemgîniyê xwe li ezmanê Kurdistanê pêça. Dîsa dilê gelê me hate şewtandin û hêstir ji çavan hatin xwar. Tu dibêje! qey qederê rika xwe li me naye, M.Uzun stêrkek geş bû di ezmanê welêt de, lê mixabin, mîrê mirinê bi lez destên xwe avêtê û ji nav me rakir.



Roja 11.10.2007an rojek bi kul bû di dîroka kultûr û rewşenbîriya kurdî de.

Di vê rojê de Rewşenbîrê me yê bi nav û deng, nemir Mihemed uzun, konê xwe pêça û ji nav me barkir, û di dilê me de xem peydakirin. Gelê Kurd, dost û hevalên wî, ji hundir û ji derveyî welêt, bi keser, li ser daxwaza wî, li goristna Amedê veşartin

M.uzun di sala 1953yan de li gundê Siwêrekê, Parêzgeha Urfayê ji dayîk bûye. Xwandina xwe ya seretayî li wir bi serî kir. Ji gênciya wî de, hesta netewî di xûna wî de dikelî û hildida, û weke kurdekî xûngerm, xwe berda nav tevgera siyasî, û li dijî kevneperestî û nijadprestiyê xebata kir. Wî li destpêkê di rêxistine ke çep de kar kir, û piştî inqîlaba 1971an, di gel çend hevalên xwe, hate girtin û heşt salan hate seza kirin, lê bi saya lêbûrîneke giştî ew di sala 1974 an de hate berdan.

Girtin û zindanê, tu carî baweriyên wî yên şoreşgerî û netewî sist û qelis nekir, û piştî ku hat berdan, wî dîsa xebata xwe berdewam kir, lê vêcarê wî berê xwe da xebata rewşenbîrî, û bû serokê desteya kovara (Rizgarî). Lê mixabin, dîsa dewletê çêrçew li dora wî tengkir û ew çav

www.arsivakurdi.org

danîn ser, ji ber vê yekê, û ji ber gef û guran di sala 1977an de, ji Turkiyê biderket, berê xwe da Europa li Siwêd bi cîh bû.

Ji sala 1985 an de, kovara (Rizgariya Kurdistanê) Weşand, û berê xebata xwe da nivîsandina roman û çêrokan, wî bêtirî 17 navnîşanan weşandin, lê ew bêtir di warê Romanê de xebitî û navdar bû.

Ji romanên wî (mirina kalekî rind - 1987, siya evînê - 1989, rojek ji rojên Evdalê Zênkê - 1991, mirina mirovekî pêşeng-1993, bîra qederê-1995, ronî evîne tarî mirine – 1998, qêrîna declayê –du beş - 2002-2003, keskesor - 2005) û gelek berhem di warê Rexne, guftugo û gotar nivîsand bû.

Piraniyên berhemên wî ji kurdî hatin wergerandin zimanin din, wek zimanên (Tirkî, Siwêdî, Almanî, Nerwêjî, Ingilîzî, Îtalî.).

M.Uzun di berhemên xwe de li ser derd, kul, êş û xemên gel, û welatê xwe dinivîsand, xwandin, nivîsandin, rabûn û rûniştinên wî tev bi kurdî bûn. Hêviya wî pir di nifşên ku nuh dighên hebû, wî digote: Bi erkên xwe rabin û kultûr û zimanê kurdî jiyanê pêde berdin. Di nav xebata xwe re, wî rexne li pîlan û gavên şaş û çewt ku tevgera kurdî pê radibû dikir, ji ber wê jî, gef û gur jî ji wî re dihatin.

Ew li Siwêd bû endamek ji endamên yekîtiya nivîskar û rojnamevanên Siwêdî, û di pir saziyên çandî û rewşenbîrî yên Siwêdî, Europî û Kurdî de kar kir û ew ji endamên rojnamevanên cîhanî bû.

Ew ji pir aliyan ve hate xelatkirin wek (Turkî, Kurdî, Siwêdî- Europî), xelata xwe ya dawiyê ji ber berhemên xwe yên nerxbilind ve, di sala 2005an de, ji Hikumeta herêma kurdistanê bû.

Berî here ser dilovaniya xwe, ew toşî nexweşiya pençeşêrê ya gede bû, li nexweşxanên Siwêdî û Europî li ser istubariya hikumeta herêma Kurdistanê hate dermankirin, lê mixabin çare ji derdê wî re ne hate dîtin. Bijîjkên wî encama dawiyê danê ku bêtirî sê mehan najî. Ji ber vê yekê Nemirê me biriyar da ku vegere welêt û di nav heval,

www.arsivakurdi.org

dost, û gelê xwe de rojên xwe yên dawiyê biqedîne.

Ew di 13-7-2006an de vegerî Amedê, û ji aliyê hejmareke pir mezin ve ji gelê Kurdistanê hate pêşwazîkirin, li ser wê pêşwaziyê M.Uzun got: (Amedê ji nû ve jiyan bi min de ber da), û ew bêtirî sal û nîvekê jiya, ew dîsa sist nebû û xwe li hember nisaxiyê da nenî.

Di nav re wî serdana stenbûlê kir, û carekê çû Siwêdê jî, piştre vegerî Amedê, û ji wir berê xwe da Gola Wanê, wekî ku dixwast xatirê xwe yê dawiyê jê bixwaze. Li wir jinişkave tenduristiya wî ji ber hev ket, û ew xistin nexwaşxana Amedê. Dema ku di nexwaşxanê de bû, nivîskarê Kurd yê bi nav û deng Yaşar Kemal çû serdana wî, wî jj M.Uzun re got: (Tu nivîskarekî pir pêwîstî, rexnevan wê vê yekê di paşerojê de xuya bikin, tu di wêjeya kurdî de bejneke zor bilind î, navê te wê bi ser bilindî di dîroka kurdî keve, ji ber ku tu bi zimanê Kurdî li ser xem, kul, derd û hêviyên gelê xwe dinivîsî, ez jî kurd im, lê tu ji min Kurdewartir î, li dema ku hebis û zîndan li benda kesên ku bi zimanê Kurdî daxivîn bûn, ma sizeya kesên ku bi zimanê Kurdî dinivîsand wê çawa be).

Belê nemirê me xemxwarê gelê xwe bû, xemxwarê pêşxistina wêje û zimanê kurdî bû, li benda rizgarkirina Kurdistanê û avakirina welatekî serbixwe bû, lê mixabin mîrê mirinê ew zû ji nav me bir û xemgîniyek û birînek kûr di dilê me de hêşt. Hêviya me ew e, ku rewşenbîrên me cihê wî vala nehêlin, xebata wî berdewam bikin, zimanê xwe bi pêşxînin, welatê xwe rizgar bikin û welatekî serbixwe ava bikin.

Dilovaniya xweda lê be, aramî ji malbat, heval, û gelê Kurd re be.

Nivîskar: Mistefa Henan

www.arsivakurdi.org

Hukumeta Sovyêtê û pirsa Kurdî
li rojhilata navîn 1947-1953

((Nivîskar: Pavil Sudeplatov
Pirtûk: Operasîyonên taybet,
(Lubyanka û kirêmil) 1930-1950.
Weşanxane: OLMA-Prêss, Moskova 1999.))

Werger ji Rûsî: Dr. M. Zeyno

Ev bereke ji pirtûka mirovekî Rûsî ye, ku demeke dirêj di wezareta parastinê KGB ya Yekitiya Sovyêtê de kar dikir. Nasekî min î Rûsî, Borîs Golob, ji min re got: Ji bo we tiştekî baş li ba min heye, ez di wê hêviyê de me, ku tu kanibî wergerînî zimanê Kurdî.
Wî ev bir kopî kir û ji min re şand, min jî dît ku ew gelek girîng e û hêjaye bo wergerandinê. Wî nasê min gote min, ku wê gelek baş be heger ez rêdana weşanxanê wergirim, her çendî navnîşana wê jî ji bo min bi rêkir, lê mixabin min nikanî nimra telefona wan bi cih bikira, ji ber hindê, ez hêvî dikim ku ev tişt nebe asteng li pêşiya çapê.

Di sala 1947an de, çekdarên Kurdan di bin serokatiya mile Mustefa Barzanî de, ketin nava şer bi leşkerên şahê Îranê re, sînorên me derbaz kirin û xwe gihandin axa Ezerbeyjanê.

Kurdên ku li Îrakê, Îranê û Turkiyê dijîn ketin bin zor û zehmetiyên gelek dijwar. Dema ku bandora dostên almaniyayê di serokatiya Tehranê de li salên 1939-1941 bi hêz bû, nûnerên dewleta Îngilîz bi Kurdan re ketin nava lîsk û lebatê, lê piştî vekşîna leşkerên wan û Sovêtan ji Îranê, wan dest ji piştgiriya Kurdan berdan.

Çekdarên Barzanî bi qasî du hezar pêşmerge û ewqas jî endamên malbatên wan dihatin hejmartin, di serî de desthilatdariya Sovyêtê guh

www.arsivakurdi.org

neda Kurdan û ew avêtin kampan, lê di sala 1947an de, Abakumov biryar da ku ez bi Barzanî re têkevim nav dan û sitandinan, û statusa penaberiya siyasî bidin wî û hemwelatiyên wî, û her wiha wan tevan transfêrî gundên derdora bajarê Taşqendê bikin, lê belê ev çalekî wê ne herdemî be.

Ez hatim nasandin bi Barzanî wek Matvêyêv, cîgirê serokê *TASS* û nûnerê fermî yê hikumeta Sovyêtê. Yekemîn care ez di jiyana xwe de rastî axakî rasteqîn hatim, lê di heman demê de Barzanî xwe nîşan da wek siyasetmedar û serokekî çekdarî şahreza, wî got, ku di sed salên dawî de, Kurdan heyştê raperîn û şoreş li dijî Îrak, Turk, û Îngilîzan kirin û zêdeyî şêst carî ji bo alîkariyê berê xwe dan Rûsyayê, wek diyar e, wan alîkarî digirtin, ji ber hindê, Barzanî berdewam dike: Di vê heyama dîrokî û dijwar de, piştî ku desthilatdariya Îranê komara Kurdan roxand, tiştekî normal e ku Kurd careke din berê xwe ji bo alîkariyê bidin welatê we.

Berî demeke kurt ji van serpêhatiyan, serokatiya Kurdên Îranê ketin xefkeke xirab, ya ku şahê Îranê ji wan re amede kiribû, ew ji bo dan û sitandinan hatin vexwendin bo Teharnê, lê ew hatin dîl kirin û bi darxistin. Tenê Barzanî ne hate dîl kirin, dema ku şah ew ji bo goftegoyan vexwend, Barzanî bersiva wî da ku ewê bê, tenê eger şah tevaya malbata xwe, wek dîl ji kampa serokatiyê ya Barzanî re bi rê bike.

Di dema dan û sitandinan bi şah re, Barzanî beşeke mezin ji leşkerên xwe avête bakurê Îranê, nêzî sînorên Sovyêtan, em ji aliyê xwe de amede bûn ku Kurdan bikin destik ji bo jarkirina bandora Îngilîz û Emerîka li welatên Rojhilata Navîn, yên ku bi Yekîtiya Sovyêtê re taximdaşin. Min got Barzanî ku aliyê Sovyêtî amede ye ku Barzanî û beşek ji efserên wî fêrî kursên taybet di akadêmî û zanîngehên leşkerî de bike, her wiha min jêre daxuyan kirin ku belavkirin û mayîna wan li gundên Asiya navîn çalekîyeke ne hemdemî ye, ta ku mercên vegera wan bo Kurdîstanê bêne guhartin.

Abakumov biryar da ku ez çi tiştî bo serokê Partiya Kommunîst ya Ezerbeyjanê *Bagîrov* diyar nekim, bi taybetî erêkirina Stalîn, ku efserên Kurdan wê di akadêmyên leşkerî de bên amedekirin.

Çêrok diyar e ku *Bagîrov* dixwest bi alîkariya Barzanî rewşa Ezerbeyjana Îranê awerte bike, lê li Moskovayê nerînek din hebû, ku Barzanî dikane roleke din û girîngtir bilîze, ew

www.arsivakurdi.org

rol jî ew bû ku bi alîkariya Barzanî divêt rejîma Îraqî bête roxandin, her wiha û ji bilî vê yekê jî me dikarî bi alîkariya Kurdan û ji bo demeke dirêj cih û boriyên neftê li Îraqê(Mûsilê) ji rejîmê re derxin, nefta Îraqê taybetmendiyeka xwe hebû, wê hemî komikên leşkerî yên Îngilîz û Emerîka li Rojhilata Navîn û derdora deriyaya sipî xwedî dikir.

Piştî axftnan bi Barzanî re, ez bi balefirê firiyam bo Taşkênt û min serokatiya Uzbêkistanê ji bo hatina Barzanî agahdar kir, piştî hindê ez vegeriyam bo Moskovayê.

Barzanî, leşkerên ji çekan rizgarkirî û malbatên wan şandin Uzbêkistanê. Piştî pênc salan, di avdara 1952 de, careke din ez ji bo hevdîtinan bi Barzanî re çûm Uzbêkistanê û ji bo çareseriya pirsgirêkên ku derketi bûn holê, ji ber ku rewşa nediyar, ango rawestandina bê hêvî ya ku Barzanî wê demê tê de dijiya, ne li gor daxwezên wî bû, her wiha têkliyên karbidestên herêmê jî gelek awerte bûn û ne li gor kesatiya wî bûn. Wî ji bo alîkariyê berê xwe da Stalîn, û daxwez kir sozên ku bi wî re hatibûn dayîn bên pêkanîn, wî bêy şert û merc daxwez kir bo perwerdekirin û peydakirina tîmên çekdarî yên Kurdan, her wiha Barzanî dixwest bandora xwe li ser hevnetweyên xwe, yên di wan salan de li kolxozên derûdora bajarê Taşqendê hatibûn belav û bi cih kirin, hîn xortir bike.

Hevdîtin bi Barzanî re li daça hikumatê, nêzî bajarê Taşqendê hate amedekirin, wergerevanê min efser Zêmiskov, ku wî jî wek Barzanî gelek baş bi Îngilîzî diaxifî, wê gavê Barzanî gote min, ku çawa Îngilîz û Emerîkiyan dixwestin wî bikirin û bikin destikê xwe ji bo çalakiyên zorê li dijî hikumata Îraqê, Îranê û Turkiyê.

Pilana ku min li ser daxweza wezîrê nû yê parastinê Îgnatêv amede kiribû, ew bû ku ji Kurdan pêwîst e tîmên taybet bi qasî 1500 kes ji bo opêrasîyonên awerte li ser qada Rojhilata Navîn bên peydakirin, her wiha me dikarî bû wan tîmên taybet ji bo hilweşandina hikumata Nurî Saîd li Bexdayê bi kar banîna, ew operasîyon dikarî bû biba sedema jarkirina bandora Îngilîzan li seranserî herêma Rojhilata Navîn (ew tişt bi alîkariya Kurdan di sala 1958 pêk hat), wê demê ez di girtîgehê de bûm), her wiha Kurdan dikarî roleka taybet di pilanên me de bilîsta, ewên ku pêwîst bûn ji bo hilweşandina sîstema bikaranîna neftê, şewitandina bîran û teqîna

www.arsivakurdi.org

boriyan li Îraqê, Îranê û Suriyê heger serpêhatiyên çekdarî an jî xetera êrişkirina atomî li dijî Yekitya Sovyêtê derkeve holê.

Barzanî ji bo morkirina peymaneke hevkariyê bi Yekitiya Sovyêtê re erêkirina xwe da, li beranberî wê hikumata Sovyêtê garantiyan bide ku komareke Kurdî damezirîne, ya ku Barzanî didît berî her tiştî li ser sînorên bakurî Îraqê, Îranê û Turkiyê, komcih û warê pirê Kurdan.

Piştî guhdarkirina Barzanî, min eşekere kir ku ez ne mafdar im peymaneke bi vî rengî goftego bikim, lê em ne li dijî damezirandina hikumata Kurdî li surginê ne, hevalê min, yê ku di hevdîtinan de beşdar bibû, karmendê beşa navnetewî, ya komîta navendî ya partiyê heval Mançixa, pêşwazî kir bo damezirandina partiya dêmoqrata Kurdîstanê PDK bi serokatiya Barzanî. Li gor Mançixa, ew partî dikare kordînasîyona karê nûnerên hikumata Barzanî li seranserî herêmên Kurdan bike, her wiha navenda partiyê dikare bibe dezgehên kolxozê, ya ku bi qasî 15 km ji bajarê Taşqendê ve dûr bû.

Ez tevlî vê goftegoyê nebûm lê min bi guhên vekirî ew şopand, piştî ku hevdîtin bi dawî bû, Barzanî ez vexwendim hevdîtinan bi efserên Kurdan re, çawa em xuyabûn bi qasî 30 kesî di odeyekê de hebûn, rabûn ser piyan wek di artêşê de bi yek dengî " hilwest", piştre ew hemî daketin ser çogan û pêrgî Barzanî bûn, rica û mineta ramûsandina keviya cil-bergên Barzanî an sola wî xwestin. Helbet her xewnek ji bo Kurdîstaneke dêmoqrat, ku berî niha min di xeyalên xwe de digerand, yekser foriyan, û ji bo min eşkere bûn ku ev yeka xeyaleke eydolocî ye di bûroyên komîta navendî de li *meydana kevin* peyda bûye.

Di nîsana 1952 de Barzanî bi malbat û hevwelatiyên xwe ve di kolxozeke mezin nêzî bajarê Taşqendê de bi cih bûn. Li Moskovayê biryar hate girtin ku otonomî ji bo Kurdan çareseriyeke baş e, her wiha biriyar dan wezareta parastinê ku kursên leşkerî ji bo Kurdan amede bikin û têkliyan bi Kurdên derve re saz bikin.

Berxwedana me ji bo ku em kanibin mirovekî Kurd ji der û dora Barzanî ji xwe re bikin ajan, bi serfirazî ji aliyê komîta parastinê ya wî de hate dorpêçkirin, bi rastî bi xêra Zêmiskov, xwedî têklî û peywendiyên dûr û dirêj bi salan bi Kurdan re, me kanî bû em efserekî bi çûk î Kurd, yê ku di akadêmiya me ya leşkerî de dixwend, ji xwe re bi ajan

www.arsivakurdi.org

kin, lê piştî ku vegeriyan Taşqendê ew bê ser û ber wenda bû, û lêgera wî bê encam ma û em gihan wê bahweriyê ku ew bi biryara Barzanî hate kuştin.

Bi xêra pirsa Kurdî ez cara yekê rastî sîstema bîrokratî bo amedekariya belgeyan ji bo polît-bûro ya partiyê hatim, Îgnatyêv biriyar da ku ez divê di bûroya Mançixî de bimînim ta ku dekumênt ji bo pirsa Kurdî serrast dibe, ew her dem gelek ze'r xweş û korêkt bû, lê dema min ji wî re got ku hevdîtinek min bi Barzanî re di hotêla Moskovayê de heye, Îgnatyêv bi tûjî ez rexne kirim, wekî ez nikanim girîngiya siyasî ya pirsê fêm bikim, û biryar da ku ez hevdîtinê bi wî re tune bikim, berî her tiştî pêwîste em biryara polît-bûro bo pirsa Kurdî wergirin. Bi min û Mançixî re Îgnatyêv çû ba Molotov û Vîşînskî ji bo nerîna wan li ser reşbeleka pirsê, wê demê ji min re hate xuya kirin ku ew herdu gelek westiyane û bê nerîn in, lê wan wêrekî girt ku bendek ji dekumêntê bête rakirin, ew bendê ku tê de hatibû nivîsandin ku wezareta karê derve divê kar û barê pirsa Kurdî bide ser milê xwe, her wiha ew herdu li ser ya xwe man ku pêwîste polît-bûro vê pirsê şirove bike, û pirs divê bête diyar kirin wek ji aliyê wezareta parastinê, lê ne ji aliyê wezareta karê derve û parastinê ve. Wê gavê min bi Mançixî re got ku em herin Lubyaka û di bûroya min de careke din tekestê biryaran çap bikin û nerîn û gotinên Molotov û Vişînskî têxin naveroka tekestan, Îgantyêv ev gav erê kir.

Lê li vir tiştek qewimî û ji min re ew bi carekê ne dihat fêmkirin, ka bê çawa emê navên endamên polît-bûro li dûv hev binivîsin, li gor elêfbayê an jî di destpêkê de endamên komîta polît-bûro ya karê derve, di vê heyamê de gereke navê Xiroşov berî yê Bulganîn be, lê emê çi bikin ji Bêriyê? Ew gereke berî navê Malênkov be? Erê bi rastî Mançixî di karê belge û biryaran de pisporekî jêhatî bû.

Bihara 1953 tiştek bi min re qewimî, ku sîstema rejîmê ya akadêmiya leşkerî ser û binî kir, tevlî min Barzanî jî di wê de dixwend, rojekê wî ez bi cil û bergên generalan dîtim û bi riya wergervanê xwe ji min re got:

gelek kêfxweş im ji têklî û peywendiyan bi berdevkê hikumata sovyêt re bi ewqas sitêr û nîşanên leşkerî.

Min jî ji aliyê xwe de serkeftin di kar û barê xwendin û dîseplînên leşkerî de ji bo wî hêvî kirin.

www.arsivakurdi.org

Cara paşin min Barzanî ji nişkeve li kolana Gorkî dît, wî kir ku pêrgî min bibe, lê min jî bala xwe dayê ku ev hevdîtin bê wate ye, min kir ku min ew nedîtiye û ez di nav koma cemawer de wenda bûm.

Barzanî têra xwe zana bû, û baş fêm dikir, ku paşeroja Kurdan girêdayî lîstika li ser nakokiya di nav bera dewletên mezin de ye, ewên berjewindiyê xwe li Rojhilata Navîn pir girîng in, û pêwîst e mirov ji bîra neke ku wan dewletan ticarî ji bo çareseriyeke mafdar ji bo pirsa Kurdî berxwenedane, her wiha qedera Kurdan li Kirêmlê ticara nehatiya rojeva pirsgirêkan û her wiha li Waşingtonê û Londinê jî.

Ji bo Rojava û ji bo me tenê tiştek girîng bû, çawa emê destên xwe bigêhênin cih û riyê neftê li welatên Rojhilata Navîn, her çendî ev rastî bi dijwarî xuya dike. Suslov, yê ku pirsa Kurdan dabûn dest, soz û peyman dan Barzanî wekî ewê alikariyeke rengareng bide Kurdan, tenê ji bo hilweşandina rejîma Nurî Saîd li Îraqê, her wiha Emerîkiyan jî soz û peymana alîkariyê da bûn wî ji bo ruxandina rejîma Nurî Saîd, ya di bin bandora Îngilîzan de bû, û li şûna wî berdevkên xwe dînin ser textê Îraqî, lê di rewşeke nazik de, dest ji alîkariya şoreşa Kurdan berdan, piştî hevpeymanan bi Îngilîzan re, bi gotinikê wek dixwestin bi qedera Kurdan lîstin.

Armanca me di salên 40-50-î de ew bû, ku em Kurdan li dijî rojava di rewşa" cenga sar de" bikar bînin, ramana dameziran dina Kurdîstaneke serbixwe, komara Kurdîstan, rê li ber me vekir ku em bikanibin rewş û pergala Birîtanî û Emerîkiyan li Rojhilata Navîn jar bikin, lê piraniya cemawerê gelê Kurd tevlî tevgera li dijî Îngilîz û Emerîkiyan nebû.

Ta nîvê duyem ji salên 50-î tenê Kurd hevkarê me bûn li Rojhilata Navîn, lê dema ku rejîma Nûrî Saîd hate roxandin, me hevkarên nû wergirtin, wekî Îraq, Suriya û Mesir, yên ji aliyê ciopolîtîkayê ve bi dehê caran ji Kurdan giringtir bûn, Îraq û Suriya rola herî mezin di siyaseta me ya derve de li dijî Rojava di vê herêma ne aram de lîstin.

Tirecêdiya Barzanî bi xwe û ya gelê wî ew e, ku di berjewndiyê Yekitiya Sovyêtê de, (û rojava û ta radayekê welatên Ereb û Îranê) Kurdan wek darekî di şer û diguşên hikumatên Tirk, Ereb û Îranê de bibînin.

Çareseriya herî hêja ji pirsa Kurdî re ew e, ku gerantiyên navnetewî ji bo otonomiyê (her çendî ew biçûk be jî), di rastiyê

www.arsivakurdi.org

de tu kesî, ne li welatên Ereban û ne jî li rojava ne dixwestin ku cih û riyên nefta Mûsilê têkevin nav axa dewleta Kurdî an jî bin kontirola wan.

Sala 1963 dema hin zehmetî di navbera me û hikumata Qasim û netewperestên Ereb de derketin, ez wê demê di girtîgehê de bûm, min hin raman û bahweriyên xwe şandin ji bo kanînên têkliyan bi Barzanî re, piştre ez hatim agahdarkirin wekî ew pêşniyarên min qebûl bûne. Ji bo Kurdan alîkarî (çek û alavên çekan) hatin şandin, ji bo ku ew kanibin welat û axa xwe li dijî êrişên ordiya leşkerên Îraqê biparêzin, lê berxwedana me ji bo ku em Kurdan ji xwe re bikin havkar bi serî nebû.

Têbînîyên werger:

1- Lubyanka: Avahiyeke mezin e li ser meydana Dizêrjêniskî li navenda bajarê Moskovayê, di wê de navenda wezareta parastinê ya sovyêtê ya bi navê KGB, cih digirt.

2- Kirêmil: Avahiyeke bedew e li ser meydana sor li navenda bajarê moskovayê ku tê de hikumata sovyêtê cih digirt.

3- TASS: wekaleta sovyêtê ya nûçeyan.

4- Bagîrov: Sekreterê partiya komunîst ya Ezerbeycanê, dost, heval û şagirtê M.K.Atatûrk, li gor agahadariyên min wî zêdî 50,000 Kurdên Ezerbeyjanê koçî asiya navîn kirin, lê ne wek niviskarê pirtûkê dibêje, ku wî dixwest Barzanî û leşkerên wî li dijî Îranê bi kar bîne, belê ya rast ew e ku eger Bagîrov kanîbûya wê ew hemo û ji bo demeke dirêj di kampên girtiyan de bihêştana, ew mirovekî ta mejî û hestiyên xwe li dijî Kurdan bû.

5- Abakumov: Wezîrê parastinê yê Sovyêtê di dema ku Barzanî gihabû Yekîtiya Sovyêtê.

6- Daçe: Gotineke bi zimanê Rûsî ye, tê wateya ku dewletê gelek xanî û malên bi çûk li dervey bajaran ji gel û endamên hikumatê re ava dikirin, ji wan malan re dibêjin Daçe.

7- Îgnatyêv: Wezîrê parastinê piştî Abakumov.

8- Meydana kevin: Meydaneke navdar e li bajarê Moskovayê, ne dûrî ya Sor e, ku di avahiyên derûdorê de komîta navendî ya partiya Komunîst cih digirt.

9- Molotov, Vîşîniskî, Suslov, Bêriya, Xiroşov: Endamên polît-bûro û hikumata Sovyêtê bûn.

10- Kolana Gorkî: Kolaneke dirêj û ciwan e di navenda bajarê Moskovayê de ye

Dortmund- Aleman- 29.11. 2003

www.arsivakurdi.org

Hevpeyvîn digel nivîskar Merwan Berekat

Pertewê Şerqî

Di hembêza sirûşta Çiyayê Lêlûn de (Şêrewan) li gundê Soxanekê devera Efrînê, di sala 1964 an de mamoste Merwan Berekat ji dayîk bû ye .

Tevî dijwariya jiyanê di hemû waran de, li devera Şêrewan ew xwendina xwe ya seretayî di gundê xwe de bi dawî dike, û ya navîn ta bekeloriya di dibistanên bajarê Helebê de kuta dike, pişt re derbasî zanîngeha Helebê beşê Îngilîzî dibe. Lê mixwebin ji ber gelek sedeman ew xwendina xwe ya zanîngehî bi dawî nake.

Mamoste Merwan Berekat di destpêka nivîsandina xwe de, di gelek rojname û kovarên kurdî de, bi zimanê Kurdî û yê Erebî nivîsarên xwe ji gotar û helbestan weşandine û bê westan pênûsa xwe ranewestandiye û her rêvebir e ta gihaye berhemên çak û sûdar û wî ev pirtûkên jêrîn çapkirine û weşandine.

1- Şeze El-eyam (شذا الأيام) helbest e û bi zimanê Erebî ye, di sala / 2002 / an de hatiye çapkirin.

2 - Pêlek ji Derya yê Viyanê. Helbest e û bi zimanê Kurdî ye, di sala/ 2003/ an de hatiye çapkirin.

3- Hemesat Memleket Elberaah (همسات مملكة البراءة) çîrokin. Û ew bi zimanê Erebî ye, di sala / 2006 / an de hatiye çapkirin.

4- Çiyayê Lêlûn di Neynika Dîrokê de (جبل ليلون في مرآة التاريخ) lêkolîneka çiyolocî, dîrokî, şopewarî û civaki ye. Ew bi zimanê Erebî ye, di sala /2006 / an de hatiye çapkirin.

5- Min Zakîret Elqelb (من ذاكرة القلب) helbeste û bi zimanê Erebi ye, di sala / 2006 / an de hatiye çapkirin.

6- Çaverêbûn. Helbeste û bi zimanê Kurdî ye, di sala / 2007/ an de hatiye çapkirin.

Pêştî vê kurtenasînê dixwazim deriyê hevpeyvînê bi mamoste Merwan re vekim.

P1 : Dema ku min helbestên te çi yên bi zimanê Erebî û çi jî yên bi zimanê Kurdî xwandin, bi rastî

www.arsivakurdi.org

taybetmendiyeka wan bala min kişand, hema mirov dibîne ku evîn pêrek ji te ye ?

Wek reh û dil bê xwîn nabin, jiyan jî bê evîn nabe, wek ku gula bê bîn ne tu gul e, jiyana bê evîn ew jî ne tu jiyan e, belê… bê pertavên evînê jiyan geş nabe, ronahiyê nabîne, wek avceniya li ser qûmê ye, bê evîn demsalên jiyana mirov bêber in.ez kanim bibêjim evîn tîrêjek ji xwedê ye, lê ne her mirovek kane xwe di ronahiya wê tîrêjê de noq bike.

Tu carî evîn ji min neqetiyaye, ne jî ji min veciniqiye, nayê bîra min ku rojekê min xwe di ser evînê re dîtiye, ez her xwe di derya ya evînê de wek pêlekê dibînim, û her pêlên evînê xwe li kendalên dilê min dixînin, û bêguman ew helbestên min, yên ku te xwendine ji wan pêlan e. lê ew ne pêlên dawiyê ne, her pêlên evîn û evîndariyê wê xwe li kendalên deryaya dilê min xînin, ta pêlên jiyanê di rehên min de hebin.

P2 : Gelek caran di helbestên te de sermstî hatiye, ma gelo ew kijan sermestiya ye?

Di her warekî jiyanê de sermetî heye, dema ku wlathezek, welatperwerek yan jî welatparêzek ji bilî neynika hezkirina welêt di tu neynikan re xwe nabîne, ma ne ew sermestê evîna welatê xwe ye. Dema ku pakrewanek can û xwîna xwe ji bo azadiyê dike qurban, bêguman ew sermeste.

Lê bi ya min be sermestiya evînê ji her sermestiyekê bi hêztire û ew bingeha her sermestiyekê ye, belê… evîna welêt pakrewanan çê dike, û pir caran evîna xwedê oldaran dîn dike, lê sermestiya evîna dilan canê jiyanê ye, jiyanê xweş û geş dike

.Yanê dema ku min di helbesteka xwe de gotiye :

Yarê ne dûr im
Di xwe de li min bigere
Wek bîn di gulê de,
Di tede wenda me.

Ma gelo eger mirov ne sermest be ji bo tiştekî, ew xwe tê de wenda dike**.**

P3: Mamoste Merwan çawa tevgera helbestvaniyê di nav Kurdên sûriyê de dibîne.

www.arsivakurdi.org

Eger mirov di gulistana helbesvanên kurdê sûriyê de bigere, bêguman ewê gelek gulên geş bibîne, û bîna her gulekê ji wan gulan bîna gulistaneka mezin dide.

Di nîvê dudiyan de ji sedsala bîstan tevgera helbestvaniyê di nav Kurdên Sûriyê de gavên baş avêtin, û bi dehan helbesvan di doza helbestê de li seranserî Kurdistanê hatne naskirin, wek :(Seyday yê Tîrêj - M. Elî Heso (Nûjen) - Mehmûdê Sebrî (Evîndarê Xemgîn) Salihê Heydo – Diya Ciwan û bi taybet berî wan helbestvanê gewre seydayê Cîgerxwîn bû) û h.w.d.

P4 :Di kîjan salê de mamoste Merwan dest bi nivîsandina helbstê kiriye û bi çi zimanî bû, bi Kurdî yan ê Erebê bû ?

Helbesta yekê di sala 1990 de bû, ew bi zimanê Kurdî bû, di bin navnîşana (Kurdê Sûrîme) de bû, ew helbesta min ya yekemîn bû, ew di kovara,XUNAV de hatibû ye weşandin.

P5 : Kurte çîrokên ku di pirtûka te ya Hemesat memleket elbera'ah de hatine, mejî û bejna mirovan dihejînin, û cihê serbilindiyê ye, ku pênûsê te ji bo Helebça ranewstiyaye, lê çima te kurte çîrokek li ser tu bûyerên din ne nivsandiye ?

Jiyana kurdan bi tev bûyerên dil bi êş in, dilê jiyana kurdan birîn e, ew birîn, ne bi çîrokan ne jî bi helbestan derman dibe, lê carna dilê mirovan bi diranên bûyerên qikirinê tê cûtin.

Bombebarandina Helebçe yek ji bûyerên qirkirina kurdan bû, tucarî wêneyên laşên zarok û şîrmijên Helebçe di himbêzên dahîkan de ji bîrnabin, raste min yazdeh çîrok li ser zarokên Helebça nivîsandine, lê yazdehear çîrok jî yek binisisîne nebesin… na nebesin.

Di sala 1988 an de min biryar dabû ku daweta min di – 20 – î Adarê de be, li roja – 16 - î adarê bombebarandina Helebça çêbû, ji ber ew bûyera reş, min daweta xwe hîşte miha Çêriya pêşîn. Ew jî yek ji sedemin ku hiştiye ez Hîroşîma Kurdistanê ji bîrnekim.

Lê Min li ser gelek bûyeran çîrok nivîsandine û ew li ser riya çapêne.

.

www.arsivakurdi.org

P6 : Pirtûka te Çiyayê Lêlûn di neynika dîrokê de pirtûkek hêjayî xwendinê ye, û berhemên wê balkêş in, ma çima Çiyayê Lêlûn ?

Her gundek, her çiyak, her şikeft û her şopewarek û geliyek li herêma Çiyayê Kurmênç, bi dehan lêkolîn bi wan divên û ji her aliyekî ve cigrafî, ciyolocî, şopewarî û her wekî din, lê divê kesên pispor bi van karan rabin. Lê çima Çiyayê Lêlûn : ji aliyekî ve ez lawê wê deverê me. Ji aliyekî din ve…. mit bi mit, gelî bi gelî, yek kevir yek şikeft min nehîştiye ku bi deh caran di wan de negeryame, yan jî li ber wan nesekinyame, yanê hema, hema ez herêma Şêrewan baştirî xwe nasdikim.

Ya din, hin nivîskaran di dehsalên borî de li ser Şêrewan nivîsandine, lê mixabin ne wek heye û nejî wek di dîrokê de hatiye wan nivîsandine. Min xwast wek heye û wek di jêderên dîrokî de li ser Şêrewan hatiye ez bibêjim, kirasê Çiyayê Lêlûn yê rast û wek ku di dîrokê de çêbûye, min li bejna wî kiriye.

P7: Eger nivîskarekî Kurd bi zimanekî biyanî bnivisîne, ew ji kijan nivîskaran tê jimartin, û pirtûkxana kijan zimanî dixemlîne?

Bêguman eger nivîskar bi kijan zimanî binivisîne ew pirtûkxana wî zimanî zengîn dike, û eger rewşenbîrek nameya xwe ya rewşenbîrî bi kîjan zimanî bi dawî bike, ew ji tevgera rewşenbîrî ya wî zimanî tê jimartin. Lê dema ku rewşenbîrekî Kurd bi zimanê xwe yê zikmak berhemên xwe binivisîne, ew hêjayî pesin û pesnedariyê ye, û serê her Kurdekî bi wî bilind e , îro roj ji her rewşenbîrekî Kurd tê xwastin ku pênûsê xwe di xizmeta zimanê Kurdî ke, û xwe di tevgera rewşenbîriya Kurd de bibîne.

Ez dibînim gelek hêjaye ku rewşenbîrên Kurd ji bilî zimanê Kurdî bi hin zimanin din jî binivisînin, belê pir hêjaye ku rewşenbîrên Kurd pirsgirêkên gel û welatê xwe bi zimanên cîhanî jî binivisînin û rewşa Kurdan bidine danasîn.

Ma gelo Selîm Berekat ne Kurd e ? belê ew Kurd e, û rewşenbîrekî di asteka bilind de ye, û di nav rewşenbîrên cîhanê de jî naskiriye. Lê ew ji tevgera rewşenbîra Erebî tê jimartin, ji ber her xizmetî pirtûkxana Erebî kiriye. Û yên wek Selîm Berekat gelek hebûn, Hamid Bedirxan yek ji wan bû, lê

www.arsivakurd.org

dema ku xwendevan di pirtûkxana Kurdî de bigere tucarî li navên wan rast nayê. Bi ya min be divê her rewşenbîrekî Kurd yên ku bi zimanên biyan dinivisînin ew li xwe vegerin û bi zimanê xwe jî berhemên xwe binivisînin, û bi ronahiya mûmên zanîna xwe quncikên tarî ji pirtûkxana zimanê Kurdî geş bikin. Belê eger rewşenbîrê Kurd bixwaze her di mejiyê gelê xwe de bimine divê bi zimanê Kurdî binivisîne.

P8 : wek diyare fêrkirina zimanê Kurdî li sûriyê qedexe ye, ma gelo divê pêdiviyên her Kurdekî çibin ?

Bêguman xwendin û nivîsandin bi zimanê Kurdî divê li nik Kurdan ji pêdiviyên serke be. xwendin û nivîsandina bi zimanê Kurdî û bi taybetî di vê demê de ji Kurdan re wek oksicînê ye, yanê bê wê nabe, bê wê Kurdejiyan nîne….. na nîne.

Ziman diyariya xwedê ye, dive her yek qasî kanibe ev diyarî biparêze. Eger pîrejinek yan jî kalemêrek, di nav sê çar zarokan de rûne û çîrokekê bi zimanê Kurdî ji wan re bibêje ewjî fêrkirine. Eger xoceyek di mizgefta xwe de, bi zimanê Kurdî şîretan li gelê nimêjvanan bike, û bi Kurdî li ber xwedê yê xwe bigere ez bawerim xwedê jî wê ji wî û nimêjvanan razî bibe. Eger evîndarek nameyekê ji dilbera xwe re bi zimanê Kurdî bi rê ke, evîn û diyariyên wî ê zelaltirbin. Eger jineka Kurd bi zimanê Kurdî bane zarokên xwe ke û bibêje werin, û bi wan re henekan bi zimanê Kurdî bike ew jî fêrkirine. Belê divê em Kurd çi jin, çi mêr, çi xwendevan û çi jî ne xwendevan bi tev alîkarbin ji bo zimanê xwe biparêzin. Ya tev girîngtir pîrek û keçan fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bikin, ji ber ew di malan de dibistanin.

Li dawiya vê hevpeyvînê ez mamost e Merwan gelek sipas dikim, hêvî ewe, ku ew di riya nivîsandin û weşanên sûdar de berdewam be û ew di nav rewşenbîrên Kurd de, pileyeke mestir bistîne, her û her pirtûkxana kurdî dewlemend bike û bixemlîne.

Heleb . 18 – 11 – 2007

www.arsivakurdi.org



MEMûZÎNA

Ehmedê Xanî

(3/4)

Rizgar Kurdaxî

- **XANÎ û zaroyên Kurmancan**

Xanî li hember serkêş û rêberên Kurmancan ên wê demê bêhêvî dimîne û tu omdiyan ji wan nahêve, lewra hêviyên xwe yên paşerojê di zarokan de dibîne. Herweha Xanî dibêje zaroyên Kurmancan fêrî Quranê bikin. Lê bila armanca wê fêrbûnê ne ya dawî be, na û ne jî ji bo jibîrkirina zimanî Kurmancî be, dîsan na. Armanc bila vekirina mêjiyên zarokan be, û di riya zimanekî alîkar re, ne zimanekî şûngir re.

Îro roj em dibînin ku Kurmancên me yên ketine bajarên mezin zaroyên xwe fêrî zimanine dîtir dikin. Di malan de, tev zarowan bi Erebî, Turkî, Îngilîzî û hwd… daxivin û dibêjin em di mal

de, tev zaroyên xwe bi vî zimanî daxivin ta ku gava ew çûne dibîstanan zehmetiyê di zimên de nebînin.

Lê ev bi xwe kuştina zimanê Kurmancî ye, bila zaro li derve bi zimanê wî welatî an bajarî baxivin ne xeme, lê di malan de, divê

www.arsivakurdi.org

tenê fêrî zimanê Kurmancî bibin, ne tu zimanên dîtir. Ev jî ger ku em xwe kurmanc dibînin???

Lewra Xaniyê nemir mîrê helestvanan weha dibêje:

Ne ji bo sahib rewacan **Belkî ji bo zarokêd kurmancan**
Wekî ji Quranê xelas bin **Lazim e li sewdê çavnas bin**
Da bi van çend reşbelekan **Li wan tebî-yetî melekan**
Derê zihnê vebêtin **Herçî bixunêt zehmetê nebîtin**

Zarok simbol in, diruşm û stêrên paşerojê ne, ew rêber, mamoste û xebatkarên siba ne.

- **XANÎ û bedewtiya keçên Kurdan**

Xanî dixwaze bedewtiya keçên Kurd derxe holê, çawa ji xwe xwaş in, çawa riwê wan her geş in, û çawa bi dilekî paqij û safî hez dikin û fîdekariya xortên ciwan dikin, tevî ku her tim jî perdên şerim û fediyê hebin jî, lê ew di yar û dilberên xwe qet naborin.

Herweha ew diçe û wan keçên bedew bi roj û hêvê re beramber dike, bi qasî ku rûgeş û stêrweş in. Xanî wan bi bedewtiya Zînê û Stiyê dipesîne:

Şehzade du bûn li nik wî şahî **Xorşîd du bûn li nik wî mahî**
Yek Seroyê riyadî rastî bû **Navê wê bi rastî Sitî bû**
Ya dî ji dil û hunavê mîr bû **wê nav ji nîvî navî mîr bû**
Rawî weh gote min bi razî **Ew hor bi nave Zîn bû**
Yek zêde şîrîn û zêde mehbob **Yek roh û horî dila bû**
Yek esmer û ya dî zerî bû **Yek Horî û ya dî pêrî bû**
Zulfên mîsalî tayî sunbul **Xedên ji rengî riwî sorgul**
Sorgul ji xwe li ser rihestî **Sunbul bi xwe pêkve daheristî**
Herçî bidiya rox û bina goş **Fîlhal biderdida ji ber hoş**
Zahir dikirin zend û baz in **Êdî ne diman gilî û gazîn**
Herçend Sitî we nazelîn bû **lê Zîn ji mîsalî horçav bû**
Herçend Sitî stêrweş bû **lê Zîn bi rox heyva geş bû**
Herçend Sitî wekî qemer bû **Zîn mehir sîfet zêde têr bû**

Şehzad: Emîr, paşe. Xorşîd: Roj. Mah: Hêv. Riyad: Bihuşt, cinet
Pêrî: Firişte, meleyîkê. Rahestî: Jîn bû, zîl da. Daheristî: Tevilhevbûn, linavhevxistin. Rox: Rûçik. Goş: Qirtik, ustû.

www.arsivakurdi.org

- **XANÎ û Newroza Kurdvejînker**

Xanî Newroza Kurdan cejna sersalê, biharê û cejna serefiraziyê ji bîr nake, ango: Dîsan wek pir çaran jî ji çîrokê dertê û mijarekê zelal yan derman dike, yan jî carna xwîner şiyar dike. Ji ramanên di vê destanê de tê xuyakirin, ku xanî ev pirtûk ne tenê ji bo çîroka evînê ji me re bêje nivisîye, na ev pirtûk pîroz e û giranbuha ye.

Ew roja Newrozê tîne ber çavan, çawa ku hemî ji malan derdikevin deşt, çiya û newalan, tev kal, pîr, zarok, keç, jin, xotr, xanim, mamoste û xatûn, tev diçin seyrangehan, dawet û dîlanan digirin, pev direqisin, Newrozê pîroz dikin û ta hêvarê dimînin û pêre vedigerin malan.

Go:Adeta pêşî zemanî **Ev bû li hemî cih û mekanan**
Dema ku şahsîwarê xawer **Tehwîl dikir di mehî azar**
Bilcumle diçûne der ji malan **Heta dighîşte pîr û kalan**
Roja ku dibûye cejna Newroz **Geş dibû ji bo me dilevroz**
Sehra û çîmen dikirine mesken **Beyda û dîmen dikirine gulşen**
Dewra felekê ji bextî fîroz **Dîsan ku nima ji nûva Newroz**
Mubana li adetî mobarek **Şehrî û sîpahîyan bicarek**
Sefbisef dimeşîne koh û deştan **Refbiref dixuşîn seyîr û keştan**
Rabûne ev xanim û xatûn **wan jî tijî gul kirine bîstan**

Şahsîwar: Ro. Xawer: Rojhilat. Dilevroz: Dilvejînker. Mubana: Li ser. Şehrî: Bajarî. Sîpahî: Artêş, leşger. Ko: Til, çiyakî bi çûk

- **Zewaca Sitiyê û Tacidîn**

Ez naxwazim van malikên jêrîn şîrove bikim, ji ber pir dirûşmahên gênîtalî (cinsî) têde hene û ezê wê ji xwîneran re bihêlim ..

Di van malkên jêrîn de, Xanî şeva zewaca Tacidîn û Sitiyê bi helbestan ji me re şîrove dike, ji kêliya ku berve hev hatine, çawa gewda wan bûye yek ûûûû…

Ji ewil ve li adetî mobahî **Destê dirêj kir surahî**
Noşî ji surahiya şekirlêva **Noşîn piyalek ji meya deva**
Serxwaş ku bû ji meya zelal **Bîhin kir gul û sunbula lîlavî**
Geh nêrgiz û lale geh sorgul **Reyîhan binefiş û geh sunbul**
Têk têkve didan û têk dibîstin **Hin buse didan û hin digestin**

www.arsivakurdi.org

Ew çendî hevdu radimûsan **Nobe ne didane hev li busan**
Almas û cewher cebîn û diranan **Tebdîl bû bi leel û mircan**
Deriya mihebetê kirî coş **Dest gerden lêvbilêv hemaxoş**
Serxwaş bûn bi wî mudamî **Bê heş diketin ji ser qîyamî**
Şekir ji lêv diyek revandin **Sorgul ji rox pêkve civandin**
Terkîb kirin ji bo xwe gulqend **Tezwîc ku bûn pêkve dîlbendan**
Sê roj û şevan bi dil piyabî **Teşnelêvan vexwarin ew meyî**
Sermestî bi dest têk heristîn **Bûn kild û kilic daheristîn**
Dem liyek pêcan û dem cuda bûn **Geh têk hejiyan û geh dilerizîn**
Dem ew du bûn û geh yek bûn **Geh cot û pêkve û geh tek bûn**
Tîra ku ji ac berhedef bû **Amac bi sefweta sedef bû**
Amac ku bû mehlî pîkan **Dûr dane bedel bi mircan**
Nubul hatîve nesil ma di wê de **Nesila xwe ji can û dil bi wê de**

Nêrgiz: Çav. Lale: Riwê gulgulî. Dibîstin: Xwe li hev pêçandin.
Leel û mircan: Yanê tena Sitiyê tev ji ramûsanan ji guvdê sipî wergerî sor. Coş: Avrabûn. Hemaxoş: Hevhembêzkirin. Mudamî: Meyî. Gulqend: Ji pelên gula û gulav û ji şêkir pev dikeve. Kilic: Pênûsa kuldanê. Mircan: Di vir de daxwaza Xanî ew e ango xwîn nîşana zewaciyê. Nubul: Tîr. Nesil: Tovav, jînav. Hatîve: Derket, vegerî.

- **XANÎ û hevaltiya rasteqîn**

Hevaltiya rasteqîn a dilsojî ya bê armanc û berjewendiyên kesane tenê li cem Kurdan hebû !.

Binêrin, bo nîmûne jî, Xanî ne tim Tacidîn û Memo anîne zimên, tevî ku du birayên tacidîn jî hebûn, yek Erif û yek Çeko bû, lê ew li ser hevaltiyê rawestiye, li ser biratiyê dibêje, ku hevaltiya rast ji biratiyê pêştir e. Cibran Xelîl Cibran jî waha gotibû:

Ye exen lem telîdhû omî!(Eyî birayê ku diya min tu ne anî ye!).

Herwaha Xanî hevaltî û dostaniyê weha dinerxîne:

Yar bi te re bêtin miwafiq **Sed xizmêd xayîn û minafiq**
Qurban bike qet mebêje kî ne **Bê kîne bira agir bi kîne**
Qurban bike qet mebê mixabin **Ci bikî bi kesan ku bê wefa ne**
Yarê te ji bo te re bira ye **Him çav ji bo te him çira ye**

www.arsivakurdi.org

- **Xizanî, xayîntî û Xanî**

Xayîntî kar û barê kesên bavnenas e. Yanê lawên tolazan, ewên ku bavê wan ne yek du an sed in, belkim va karê qirêj û gemar bikin ango: Xinizî û nokeriyê li miletê xwe bikin.

De kanî em gotinên Xanî pevre bixwînin:

Ew kînewer û xebîsî mudeber — Yanê Bekirî bi dil mizewer
Tirsa wî hebû bidizî ji Tacidîn — Dayîm di dilê wî de, hebû kîn
Tenha waha gote mîr di xif de — Mîrêm te Sitî qewî telef de
Navê wî munafiqî Bekir bû — Belkî ji Biloqiye bedtir bû
Bed cehre ji rengî deyosî kabos — Bedkarî stîzeyîkar û salûs
Mîrêm te nedî kurê Skender — Dayê te nezer, ji hed çû der
Roja ku Sitî te daye Tacidîn — wî ji aliyê xwe daye Mem Zîn

Û dibêje:

Ger îzin bidêt ji bo min mîr — Ez dê bikujim Mem bi tedbîr
Tacidîn û bira bi şerabek — Tu dişî demekê ewan bikî qehir
Emirî ko dibêt tidarek asan — Ageh meke pê tu xelik û nasan

Kuştina xiyanetê û sembolên wê Bekirê bavnenas:

Tacdîn û Bekir bê îtîfaqî — Bûn herdu li erdekê mulaqî
Go: Ey sebebê fesadê alem — Şeytan sîfetî lê ji şiklê adem
Ey sebebê fitne û fesadan — Wey maniyê meqsed û muradan
Ey perde dirê Memê û Zînê — Wey daxî keşî li ser birînê
Iblîsê xebîsê pir nedamet — Bes nîne li min te kir qiyamet
Derheqê Memê sexet xeber da — Heta ko li min te Mem bi der da
Evçende munafiq û neyar î — Hêja tu bi çavê min diyar î
Mem dê bimirit tu dê bimînî — Hêj xweş bigerî li rûyê zemînî
Hadir wî Bekir di erdê rakir — Cismê bi bela ji can cuda kir

Axaftina Zînê li ser kuştina Bekirê genî:

Tacdîn ji rûyê dinê fena kir — 'Alem bi fenayiya wî şakir
Lewra ko xwidanê ins û canan — Wî xaliqê erd û esimanan
Roja ewî hub da hebîban — Hîngê ewî buxd da reqîban
Em sorgul in ew ji bo me xar e — Em genc in ew ji bo me mar e
Gul hifzi dibin bi nok û xaran — Xaşxaş xwîdan dibin bi maran
Xelqê ko bi esl bedsiret in — Ew esil ji wan qe têtе şuştin
Çil salî tu henzelê biçînî — Sed avî bidî bi hingivînî
Perwerde bikî bi afitabê — Herdem bireşînî lê gulavê
Heroj reha wê lê bi kerkî — Wê fasileyê tijî şeker kî
Xizmet bikirî tu hindî wan e — Ew bo te dibîte hindiwan e
Da fikir nekî dema ko ber bidêt — Ew xêyrî ji teliyê semer nadêt

Spas…

www.arsivakurdi.org

Marie Luise Kaschnitz
(31.01.1901-10.10.1974)

Wergera ji Almanî û amadekirin:
Tengezarê Marînî

Di 31.01.1901 Marie Luise Kaschnitz li Karlsruhe Ji dayîk bû. Bavê wê serdarekî leşkerên Bad preuf (axagihekî Elmaniya) bû. Marie Luise Kaschnitz li Potsdam û Berlin mezin bû. Tevî ku rewşa wan ya mewdanî baş bû, lê wê zarokatiyeke ne baş derbas kir, tim bi tirs û şermok bû û tim dixwest nêzîkî bav û diya xwe be.

Li 1914 Di destpêka cenga cîhanê ya yekemîn de cihê xwe guherandin û berê xwe dane Bollschweil.

Dûrbûna bav û dê ji hev, hişt ku zarok fêr bibin, çawa bi tenê dikaribin li ser piyê xwe rawestin.

Li 1921 - 1924 Marie Luise Kaschnitz li Weimar diçe dibistana Hesêb û piştre li München li weşanxaneya Recht kar dike.

Li sala1925an di firotgeha pirtûkên bikarhatî de li Roma kar kir. Di wê salê de bi Guido von Kaschnitz-Weinberg yê Archäolog re

www.arsivakurdi.org

dizewice. Û sala 1928an Keça wê Iris Constanza ji dayîk dibe. Di vê salê de helbesta xwe ya yekem dinivîse.

Li sala 1930î Weşana çîrokên destpêkê ji hêla Max Tau û Wolfgang von Einsiedel di Antologiyekê de li ba Bruno Cassirer bi navê "Birîndarkirin - Pexşana neçapkirî" tête weşandin. Li sala1933an Romana bi sernavê " Evînê dest pêkir" çap dibe. Ji vê salê ve jî dest bi nivîsandina helbestê kir. Li sala 1937an Romana wê ya diwem "Elissa" tê weşandin. Li sala1943an jî Çîrokên " Efsanên Yonaniyan" weşand.

Di pey re hest kir, ku tu hêza wê nîne, ku li dijî rêjîma naziyan têbikoşe, rabû xwe ji civakê vekişand. Di nivîsa xwe de"dever" weha nivîsandibû:

"Frankfurt di cengê de û wê bigihe kîjan serketinê di xerîbiya me ya hundurîn de?

Ji 1945 gelek berhemên Marie Luise Kaschnitz di kovarên pexşane û helbestê de hatine weşandin .

Di sala 1946an de pirtûkeke wê ya pexşane derket û her weha pirtûka wê ya helbestê ya yekem jî.

Li sala 1947an de pirtûka wê ya bi navê " Dîlana mirî û helbestên niho" hatibûn weşandin.

Li sala 1949an biografiya Gustave Courbet di bin sernavê "Rastî ne xewn" hate weşandin.

Li sala 1952an Pirtûka wê ya çîrokan ya bi navê " Zarokê qelew" ew kire nivîskareke bi navûdeng.

Li sala 1955an Xelata Georg-Büchner wergirt. Di Zermoniya xelatwergirtinê de, peyveke pir bi nirx pêşkêş kir û got:

"Hemî helbestên min derbirîn in ji bêrîkirina min ji welatê min re, êşên xerîbiyê ne, geriyan in li bêgunehiyên kevin an jî li bêrîkirin û geriyana sîbera evînê, ku cîhanê bi rêkûpêk bike, ew dilxweşkirina erzan, ya ku hinek xwêner di helbestên min de bendewarê wê ne, min neda û nexwest jî bidim. Û eger malikên min ... hatibin fehemkirin, ew jî bi wê ve girêdayî ne, ku helbestê ez ji suruştê berbi mirovahiyê ve birim, bêy bikarbim ji bîr bikim, ku ez xwe wek mirov pêşkêş

www.arsivakurdi.org

dikim."
Li sala 1957an Xelata Immermann ya bajarê Düsseldorf werdigire.

Li sala 1960î Marie Luise Kaschnitz li zanîngeha Frankfurt waneyên Poetik dide.

Ew endama navenda PEN ya Almanî, endama akadîmiya Almanî bo ziman û helbestê li Darmstadt, endama akadîmiya ciwaniya huner ya München û endama akadîmiya Mainz ya zanistiya toreyê bû.

Li sala 1968an Dektoreya rûmetê ya Zanîngeha Johann-Wolfgang-Goethe li Frankfurt wergirt.

Li sala 1970ê xelata Hebel ya îyalet a Baden-Württemberg wergirt.

Li sala 10.10.1974an Li Roma " Îtaliya" jiyana wê bi dawî tê û li gundê wê Bollschweil tête veşartin.

Bax

Bax aşêf dibû
Dar hatibûn kesxandin
Li ser zinarên rût kolik ava bûbû
Derdor bi keviran lêbûbûn
Darên hejîran danîbûn
Bîreke avê kolabûn
Ez bi xwe
li xaçerêkê behitî mabûm
Ji ber diçûm, li derdorê digeriyam
dewl di ava şor ya jiyana xwe dadikir
Zirîna kerê
Bi jor ve ta bi stêran..

Alîkariya pêşîn

Cihê herdem tu,
tu ne yê pênegehiştî bûyî
Destê min yê çavkuriyê tu bi paş ve vekişandibûyî
Ji kefa derya ya qirêj.
Di tora gilover de
li ser kenarê bi lat,
min tu dêwek kişandî
Li ber min tu
mîna yekî jihevketî diyar bûyî
Min zikê xwe bi yê te gerim dikir
Hilma xwe bera devê te dida Tenê,
dema çavên te li bin tayê sor bûn
yên mîna qûmê rep bûbûn
Ji kokê ve nevebirûstîbûn
Ne asîman
ne jî rondikên min ên xeyîdî.

www.arsivakurdi.org

Balinde

Hîn jî cotek balinde hemdem
Lê niha mîna newekhev
Yek çavbirçiyê nikilan
Jiyana kurt ya mayî
Di belgên gerim de.
Yê din reviyayî
Sîbera wî diyar e
Li ser zeviyê berfê şemitî
Sê xîşik kişandin
Her xîşikeke hinekî rengavêtî
bû
Bêqîrîn ji ewran
Pirtik berbi jêr de nehatibû

Welatê min

Min welatê xwe veşartiye
digel masiyên qerisîa
Û bi xuşxûşa pûşê garis
rêka min berbi azadiyê ve
Min gayê berfê kişandibû
berev cama pencerê
Ji bo mêvanên xwe
Ez di quleke gilover de pişikîm
Tu çavên min dibînî
Qoziyên mijankên min yên
westiyayî
Daku nîva şevê bi garis bête
pakkirin
Ji xuşîna berwarê cinan.

Kevirê di pêlavê de

Hîn jî diazirîne
Kevirê di pêlavê de ?
Eve demeke dirêj e, dibim û tînim.
Bêsûde ye,
gorê diguhêrim
an jî sersokê
di deryaya tirsê de
Keviz,
keviza riya daristanê, keviz
Bîr û ez di dest de
Zarokekî xeyalî
ji min bi xwe stend
Rêka senoberê berbi jor ve
Bo tîrêjkên kahniyê û testa gewr
Kevir
kevir
ji ser dilê min daket.

* ji pirtûka Marie Luise Kaschnitz, Kein Zaubere Spruch= ne peyveke Sihirbaz, weşanên Suhrkamp 1310, 1986.

www.arsivakurdi.org

Diçim paleya sitêran

Diçim paleya
sitêran
Çendên salan
Bi daseke ko,
Bi daseke, şikestî
û
Zingar girtî.
Diranên ji têxtik,
Ji xwe pêve nacû.
Ronahî,
bi ronahiyê diçe,
lê şev, bi şevê,
Naçe,
ger ne bironahiyê
be.
Hiskirin,
kaniya zanînê ye,
her cihî,
geş dike,
xweş dike,
ava dike,
û
navnîşana mirovan
e,
sîwana dilan e,
renge reng e,
gurze gurz e,



bexçên gulan e.
ez xweş dizanim,
axa min,
bê av e,
bi hêstiran tenê,
nayê avdan.
ez xweş di zanim,
tîrêjên roka min,
ji tîpên xwînê ne.
bi ser min de,
dirijên,
himbêza min
tijî tîp in.
lê ez nikarim,
dîroka xwe,
jê çêkim.
Ez nikarim,
Navê xwe,
pê deynim.
ji ber ku,
hemû tîpên min,
mîna hev in.
lê bi kinahî
û
bi dirêjahî
bi tenê
ne wek hevin.

Durust - **Şam** 8-2007

www.arsyalurdi.org

Yara devliken

Di şevek jibîrkirî de
Bêdengî bê deng bû
Kerbûn sûlav.....
Balinde, li hêlînên xwe
Vegeryan, lûs dibûn
Şêrînbûna kêlîkên penaber
Ez disotim
Gula xilmaş, xwe
hino hino....
digindirand û
bi ser germiya evîna min de
girt û ez
himbêz kirim.
Ji ewrên ramanên min
Zivistan hate xwar
Û.....
Bahoz ji ber lêvê yara min
Reviya û
bi wêde çû.
Yara devliken....
Û tevde gul
Sirûda evîna min
Ji kûrbûna nalîna rojê werdigirt
ji valabûna tûrkê min re
kire diyar
roj.....
stêrik ....
û heyv
ji esmanê bê pariyê
kom kirin
ji lalbûna yara min re
govend girêdan
jêre kirin
dîlan û sema

Nûşîn bêcirmanî - Tirbespî 4-6-2007

www.arsivakurdi.org

DE WERE

Mürüvet Y.Cacim
Bakurê Kurdistanê

De were tariya dilê min
ramana min a koçber
weke êşekê bikev nav bedena min
ji bedena min biqetîne vî rihê kole
benda te me ez
bibe xumam û hêsir
di kortikên çevên min de
û bibare dilop dilop
paxiş bike demên çûyîn ên bi qilêr
ji min re dîrokeke nû binekişine
De lorî
De were tenêbûna min
xwe berde şibaka dilê min
û bi tenêbûna xwe ve were
tu di ramana min de yî
ramana min bi te ve ye
bê kesiya te Qeyd û zincîr in
dilê min de
dilê min tenêbûna te dihêre
De lorî bihêre lorî
de were evîna bê evîndar
bê deng bibhîze hewara dilê min
wek beybunê vebe li ruyê min
da ku ez menzila evinê de me
Hey wax tenêbûn tenê hatiye
Benda bihareke din bibe
aah dilê min lorî de lorî

www.arsivakurdi.org

KEÇÊN PÎRÊ

Danhev: Rezo

Hebû, nebû, min ne behwer bû, lê dibêjin ko sê keçên pîrekê û kereke wê hebûn. Kera pîrê mefera wê bû, ya çûn û hatinên wê bû . Keçên wê jî sebr û samanên wê bûn, dol û jêmayên mêrê wê bûn. Rojekê ji rojan, pîr li ser kera xwe dakete bajêr, da çekan ji keçên xwe re bikire. Li bajêr , bazara xwe kir, bexçika xwe tije cil û caw kir, li pişta kera xwe bar kir û ji vegerê re, bi kêf û şahî xwe kar kir.

Li vegerê pêrgî dareke guhîjan hat, ko va ji guhîjan xemiliye. Dilê wê bijiya wan, û ji xwe re got: "Çima ez guhîjna nadim hev û ji keçên xwe re nabim?".

Pîr li bin darê daket û bi daneheva guhîjan ket. Têra xwe guhîj dane hev û karê xwe û siwarbûna kerê kir. Lê berî li kerê siwar bibe û bimeşe, qîrênek kete guhên wê: "Lê , lê pîrê bisekine, nemeşe, tu ji lepên min xilas nabî !".

Dengê qîrê ew mêrg tev hejand û pîr pêre pêre bizdand. Pîrê, ji tirsê, di cihê xwe de bê livandin ma.

Dîtina ko dît, va ye Dêwek li ser pişta kera xwe, ber bi wê de diherike. Gava giha, got: "Hooooş, bê hevsar û bê sergoş!". Dêw daket û ji pîrê re got: "Ev dara guhîjan dara min e. Te guhîjên wê, ji xwe re jê kirine. Ji xwe re di têra xwe kirine û nema li darê vedigerin. Here, xwedê bi tr re be. Lê her ko tu şorbê li êgir bikî, kara min bike, ez mihvanê te me !".

Pîrê, ji tirsan re, ne erê kir, ne na kir. Hema zixtikande kera xwe û bi kul û keser, da ser riya malê. Gava giha malê, rengê wê zer û zerhinî bûbû, bûbû rengê qeşûfê.

Keçên wê pêre rabûn. Keça mezin pirsî :

- Çi bi te hatiye, yadê. Çima wilo zermirî, bê madî!?.

Pîrê, çîroka xwe û Dêw ji keçê re got. Keçê bi dilsarî lê vegerand, got:

- Wîîîî, min go belkî tê bêjî, xwazgênciyên te hatine!!.

Keça navê hat û ji diya xwe pîr pirsî :

- Çi bi te hatiye yadê. Çima wilo zermirî, bê madî!?.

www.arsivakurdi.org

Pîrê, çîroka xwe û Dêw ji keça navê re jî got. Keçê bi dilsarî lê vegerand, got :

- Wîîîî, min go belkî tê bêjî, xwazgênciyên te hatine!!.

Keça biçûk hat û ji diya xwe pirsî :

- Çi bi te hatiye yadê. Çima wilo zermirî, bê madî!?.

Pîrê, çîroka xwe û Dêw ji keça biçûk re jî got. Keçê bi nermî lê vegerand, got :

- Baş e yadê. Mitalan neke... Em nema şorbê li êgir dikin. Wilo, em tirsa Dêw ji nava xwe radikin û dilê te dikin cih.

Demek di ser serpêhatiya pîrê û Dêw re derbas bû. Pîrê û keçên xwe çîrok ji bîr kirin. Wilo, carekê şorbek li êgir kirin û çawa li ber xwe danîn, dengê Dêw li ber derî hat: "Hooooş, bê hevsar û bê sergoş!". Ji ser pişta kera xwe daket, derî vekir û derbasî hundir bû. Bê gotin li ser şorbê rûnişt. Şorbe vexwar, devê xwe paqij kir û rahişte destê keça mezin û ji malê der ket.

Dêw, keça pîrê gihande mala xwe, gihande cih û warê xwe. Mala Dêw qesreke bi heft dergehan bû, li pişt heft av û heft çiyan bû. Li mijeka azmanan bû, ne kesî dî bû, ne kesî bîna bû. Dêw, miftên şeş deriyan dane dest keça pîrê, lê mifta deriyê heftan bi xwe re hilanî. Û keça pîrê, li ser kevelê Hirçekî, li ser kevelê Şêrekî rûnand û çênîk goştê xav î genî li ber danî, û got:

- Ezê herim nêçîrê. Berî ez vegerim, divê te ev goşt xwaribe.

Piştî ko Dêw derket, keça pîrê ew goşt quliband vî alî, quliband wî alî, lê ew nayê xwarin. Her ko lê dinerî, dilê wê li hev diket. Rabû ew goşt di kunekî de veşart. Gava êvarî Dêw ji nêçîra xwe vegerî, ji keça pîrê pirsî:

- Te ew goşt xwar?.

Keça pîrê, bi tirs û xemgînî li Dêw vegerand:

- Erê, min xwar.

Dêw bi dengekî li goşt kire gazî, bangkir:

- Goşto, tu di kû de yî ?.

- Ez di kunê banî de veşartî me ! – Goşt li Dêw vegerand.

www.arsivakurdi.org

Bi bersiva parçê goşt re, Dêw pifek bi ser keça pîrê de şand, ew ji wir, ji ber çavan winda kir. Tevlî kevel ew rakir.

Demeke din jî derbas bû, pîrê dîsa şorbe li êgir kir, çêkir û li ber xwe û herdu keçên mayî danî. Çawa li ser sifra xwe rûniştin, Dêw li devê derî deng derxist: "Hoooos, bê hevsar û bê sergoş". Ji ser pişta kera xwe daket, derî vekir û derbasî hundir bû. Bê gotin li ser sifra şorbê rûnişt... Şorbe vexwar, rahişte destê keça navîn û derket.

Dêw, keça pîrê gihande mala xwe, gihande cih û warê xwe. Mala Dêw qesreke bi heft dergehan bû, li pişt heft av û heft çiyan bû, li mijeka azman bû, ne kesî dî bû, ne kesî bîna bû. Dêw miftên şeş deriyan dane dest keça pîrê, lê mifta deriyê heftan bi xwe re hilanî. Û keça pîrê, li ser kevelê Hirçekî, li ser kevelê Şêrekî rûnand û çênîk goştê xav î genî li ber danî, û got:

- Ez ê herim nêçîrê. Berî ez vegerim, divê te ev goşt xwaribe.

Piştî ko Dêw derket, keça pîrê ew goşt qulibande vî alî, qulibande wî alî, lê nayê xwarin. Her ko lê dinerî, dilê wê li hev diket. Rabû, ew goşt di kunekî de veşart. Gava êvarî Dêw ji nêçîra xwe vegerî, ji keça pîrê pirsî :

- Te ew goşt xwar?.

Keça pîrê, bi tirs û xemgînî, li Dêw vegerand:

- Erê, min xwar.

Dêw bi dengekî li goşt kire gazî, bakir:

- Goşto, tu di kû de yî?.

- Ez veşartî, di kunê banî de me! - Goşt li Dêw vegerand.

Bi bersiva parçê goşt re, Dêw pifek bi ser keça pîrê de şand, ew ji wir, ji ber çavan winda kir. Tevlî kevel ew rakir.

Wilo, Dêw keça biçûk jî bir. Lê, wê çêniyê goşt da kitika malê. Û gava Dêw pirsî:

- Goşto, tu di kû de yî ?.

- Ez di nav hûr û pizûran de me. - Goşt li Dêw vegerand.

Hinga, Dêw keça pîrê li cem xwe hişt. Dilê wê, ne ji xwarinên xweş, ne ji cilên xweşik û ne ji xişrên hêja ticarî dihişt. Ew kire xatûna malê, du cêrî jê re anîne bermalê û navê wê hilnedida, badikir: "Wa delalê". Lê çawa be, keçikê bêriya mala xwe kir, bêriya pîra diya xwe

www.arsivakurdi.org

kir, û bi şev û rojan mitale kir. Rabû, şevekê miherka xewê kire guhê Dêw de. Heft şev û heft rojan ew di xew de hişt. Mifta deriyê hefta ji nav riha wî derxist. Derî vekir û kara reva xwe kir. Berî bireve, dengek kete guhên wê: "Law, ne reve... Wê Dêw dîsa te vegerîne!". Berê xwe li pêjna deng guhert, dît va Dêwepîreke, hingilên xwe di ser milan ve avêtine ser pişta xwe. Keça pîrê jê pirsî: "Tu kî yî, li vir çi dikî!?". Dêwepîrê bersiv da: "Law, ez diya Dêw im!". Hinga, keça pîrê, weke birûsk, xwe avête pişt wê, û hingilê wê xiste devê xwe. Wilo, Dêwepîrê got:"Law, tu çi dixwazî bêje, ez diya te me!".

- Ez di bextê te de me, pîra diya min bi tenê ma ye, wê dîn bibe. Rêkê, çarekê ji min re bibîne ko ez lê vegerim.

Dêwepîrê destê xwe avête bexçika xwe, şehek, lihek sabûn û sewîlekî avê jê derxistin dane keça pîrê û got:

-Law, wê Dêw heft şev û heft rojan di xew de bimîne, roja heştan wê pey te bikeve. Jê netirse û sehwê jê negire. Her ko nêzîkî te bû, tiştekî ji van bavêje pêşiya wî. Gava Dêw dev ji te berde, tê teyreke Sîmir, li pêşiya xwe bibînî. Jê netirse, li pişta wê siwar bibe, wê te bigihîne dara Guhîjan.. ji bîr neke, teyra Sîmir mirad e.

Keça pîrê, şeh, lihê sabûnê û sewîlkê avê hilgirtin, xatir ji Dêwepîrê xwest û da ser riya revê. Lê, roja heştan Dêw nêzîkayî lê kir. Keça pîrê şehê xwe avête nav lingên wî. Ew şeh bû dirih, bû stirî û bû kelem li pêşiya Dêw. Lingên wî birîn kirin û keça pîrê jê dûr kirin. Lê, piştî Dêw xwe azad kir, dîsa nêzîkayî li keçikê kir. Vê carê, lihê sabûnê avête pêşiya wî. Ew lih, li ber Dêw, bû çiyayên kefê û latên şahîk. Dêw dişemitî, diçerixî, diket, radibû, lê dîsa xwe azad kir û nêzîkayî li keçikê kir.

Vê carê, keça pîrê sewilkê avê avête ber lingên Dêw. Ava sewîl bû lehî û şelîpan, pêlên wê Dêw qurpandin. Wilo, piştî vê revê, vê helebezê , keça pîrê bêhiş ket. Carekê çavên xwe vekirin, dît ko va teyra Sîmir li wir pirtikên xwe nikil dike. Gotina Dêwepîrê hate bîra wê.. bêtirs li teyra Sîmir siwar bû û giha mirada xwe, giha mala xwe cem pîra diya xwe. Û çîroka xwe jê re got. Lê, pîrê ji derdên keçan aqil berda bû. Ji çîroka keçê, tenha tiştek di hişê mayî de digijmijî û ji devê keçê ji ber bû. Ew jî ev bû: "...du cêriyên min hebûn, herdu cêrî cin bûn, lê rengê xuhên min bûn...".

www.arsivakurdi.org

Roviyê Xapînok

Rojekê ji rojan wekî ku Şêr paşayê Daristana Reş e, deng li hemo Ejalên malbata xwe kir, ew li hev civandin û ji wan re got: welatiyên min ên hêja û xweşewîst, em nikanin bi vî rengê ku em têde dijîn berdewam kin, birastî em bûne cihê ken û tirqiyên xelkê.

Va ye komelgeha cinawiran tev ken û tirqiyên xwe, ji ber rêtina xûnê ya pîs a ku di nav me de, bi me dikin, em bi şev û roj xûna hev dirêjînin. Ji fedîbûnê nema ez dikarim derkevin beramber paşayên din, ji ber ku yê ji me liserxwe, yê jar û kesê xwe tune ye dikuje û dixwe, û her yek ji welatiyên min dijminê yê din e. Kes ji kesî hez nake û alîkariya hev nakin, bi şev û roj her yek dixwaze yê din tune bike.

Ji ber vê yekê, ji îro û bi şûnde, ez fermanê didim tevan, ku em bi hev re, wek xûşik û bira bi hev re bijîn. Rêzdarî û hezkirin dinav me de hebe, ji we her yekî tê xwastin ku pêşniyariyên xwe ji min re pêşkêş bike, kanî emê çawa vî karî û peymanê bi cîh bînin.

Her yek ji wan bi ser xwe de mijûl bû û ramiya ka çawa wê bi hev gihînin û armanca Şêr bi cîh bînin.

Li dawiyê biryar dan ku her roja yekşemê li mala yekî li hev rûnin, di wê civînê de dê ber hev werin, û baş hevdu binasin, ewê bi vî rengî di aştiyê de bijîn, gizgizî, pevçûn û xwîn rêtin ji nav xwe dûrxînin. Û ji bo rêz û rûmeta padşê, divê civata yekemîn li koşka wî be.

Li roja yekşemê, cinawir (ejal) tev li pêş koşka Şêr civîn, û bi rêz û hurmet li pêş seydayê xwe bê deng û liv rawestîn. Padşayê daristanê li pêş wan rawestî, serê xwe ji wan re tewand û silav li wan kir. Wî berve jêr dinihêrî û xwe dikir ku nizane çi bike. Rabû ji wan re got: Xweşewîstên min yên giranbuha, win li ser seran û çavan hatin. divê ez bînim bîra we, berî ez deriyê mala xwe ji were vekim, ez jî wek hemo padşayên daristanan, xwarina min ne geya û çawîr e, xwarina min goşt e, loma jî dibe ku bihna xûnê ji mala min were, divê win vê yekê zanibin û gazinan ji min nekin, û ji min re nekin kêmaniyek. Tevan bi

www.arsivakurdi.org

hev re gotin: Xem nîne paşayê me, xem nîne.

Yekemîn car e ku ew derbas mala seydayê xwe dibin, wan bawer nedikir ku ewê rojekê têkevin mala wî, ji ber wê jî pir şa bibûn.

Berî vê demê, ji tirsê re newêrîbûn nêzîk mala şêr bibana, eger yek caran di ber re derbasbûna jî, hema bi lez diçûm. Dema ku Şêr deriyê mala xwe ji wan re vekir, mêvan yekeyek li pey hev derbas bûn hundir malê.

Li pêş wan Geyîk (xezal) berî gişkan kete hundurê malê. Ew ejala nazik û delal, ya ku jiyana xwe di nav geyayê xweş û kulîlkên bîn xewş de dibuhurand, bi ketina wê di hundur odê de, hulma bîhneke pîs û genî kete bêflên wê.

Xezalê got: Ev çî ye ?!! Ev çi bîhenke genî ye ji mala te tê seydayê min. çawa tu dikarî di maleke wanî genî de bijî ??.....

Piştî wê gotinê, hema bi lezûbez paş de vegerî û xwast ji mala Şêr derkeve, lê Şêrê serê çiyan ji wê bi leztir bû, kire humehum û borebor, û lexmek avête wê, bi dirnaqên xwe yên wek kêra qelemteraşê di cîh de gêr kir, Xezala nazik giyanê xwe ji dest da û li wir dirêj bû.

Şêr bi çavên sor û mirûzekî tirş li ejalan vegerî, kire borebor û Humehum, hema bi çavan nîşanî Xezala dirêjkirî kir û got: We bihîst va Xezala mirûz pîs li ser ciyê ku seydayê wê tê de dijî çi got!.

Berî win derbas mala min bibin, min ne got ku carna bêhna xwînê ji mala min tê, min bi xwe ne got??! Min ne got xwarina min tenê goşt e? min bi xwe ew ji we re aşkere kir.

Lê eger çi bibe, ez rê nadim kesên kêm ku zimanê xwe dirêj bikin, min bikulînin û min bê rûmet bikin. Kanî win rastiyê ji min re bêjin, ma bi rastî bihna mala min ewqas genî ye? Borbora şêr ejal tev di cîh de hişk kirin, kesî ne diwêrî devê xwe jî vekira, ji ber ku ya Şêr anîbû serê Xezalê li ber cavên wan bû, loma, kesî devê xwe jî venekir, cinawir tev paş de vekşîn û di quncikikî tarî de xwe dan hev.

Ji nav wan meymûn xwe da ser hev û çû li seranserî mala Şêr gerî, kenekî sar û ne ji dil de kir û kenî, dibe re jî ji bêhna bayê genî yê ku ji mala Şêr dihat, bêhna xwe kişand û bi gotinên hunguvî û çêkirî ji Şêr re got: Tiştê ku min şêt û mêt dihêle seydayê min, çawa va Xezala kêm hiş kanî bû van gotinên kêm û derew li ser seydayê min û mala wî bike? Ev gotin nakevin mêjiyê min.

Mala we seydayê min, ne tenê bêhna genî û pîs jê nayê,

www.arsivakurdi.org

belê bihneke xweş, bihna kulîlikan jê tê. Wek ku te di nav Baxçeyekî ji kulîlkên rengareng û fodil de xwe daye hev.

Lê gotinên Meymûn yên hungivîn û çêkirî hîn bêtir Şêr har û çav sor kir, li şûna ew aşt bibe, hîn bêtir har bû.

Şêr li Meymûn vegerî û got: His be, bê deng be Meymûnê dernexûn. Şêr dîsa kire borebor û got: Ew çi baweşîn û kulîlik û bêhin xweş e tu dibêjî. Ew çi Baxçeyekî Fodil û Rengereng e ku tu tînî ser zimanê xwe. Ma ez mala xwe nasnakim? Qey ez bêhnan nakim û ji hev dernaxînim,? Ma ez nizanim çi bêhin ji mala min dertê? Ma Tu dixwazî henek û terqên xwe bi min bikî, Meymûnê ber dîwaran?

Berî ku Meymûn bersivê bide, Şêr lepek li wî jî xist, ew jî gîhand Xezalê li rex wê dirêj kir.

Şêr bi nêrînên tûj û hov li wan temaşe kir, û yekser li Rovî nihêrî û got: Roviyo ka tu rastiyê ji min re bêje?.

Ma bi rastî bêhna mala min wek Xezalê gotiye? An jî baxçeyek ji Gul û kulîlkên bêhin xweş e wek Meymûn gotîbû ?

Dema ku Rovî ev gotin bihîstin, têgihîtş û naskir çi li pêş wî jî heye, çavekî wî li Xewzala bêgiyan û dirêjkirî, ya ku rastî gotibû, û çavek jî li laşê Meymûnê dernexûn û derewîn bû. Rovî Rabû bi zikxûşkê berve Şêr çû, xwe li ber lingên wî dirêj kir û kire nalenal û ax û of.

Rovî got: Li min bibore seydayê min, ji ber ku bûye hefteyek ez bi sermê ketime, nema ez dikarim bêhna genî ji ya xweş cuda bikim, di bextê te de me, çend rojan bersiva pirsa xwe bişûn xe, seydayê min ezê piştî çend rojan amede bim, piştî serma ji min here ezê bersiva seydayê xwe bidim.

Bi vî rengî Rovî hêrs danî û bi lez û bez ji mala bîn genî û nexweş derket derve û reviya çû nav daristanê. Cinawirên din jî derfet dîtin, ew jî li dû hev, bi tirs ji mala Şêr derketin çûn nav daristanê, ji bivehiya Şêr rizgar bûn û jiyana xwe berdewan kirin.

Wergerandin ji Erebî: Mistefa Henan



www.arsivakurdi.org

Bajarê Efrînê

Dr. M. Elî

Bajarê Efrînê navenda navça Çiyayê Kurmênc e û navê xwe ji navê çemê Efrînê biriye.

Jêderên dîrokî dibêjin, ku di serdema Romanî de, riyeke Romanî ye kevirkirî «lezok» di cihê Efrîna niha re derbas dibû. Roja îro gava ji bo avakirinê xak tê kolan, li herdu aliyên şeqama riya Cindirêsê, kevirên şekirî û kûzên qermîtî yên mezin derdikevin. Ew jî diyar dike, ku ev cih ji zû de şên bû.

Li ber Kendalê çemê Efrînê yê rastê jî, gelek şikeft hebûn, niha dibin malan de mane, diyar bû ku ew jî, ji kevin de ji hêla bazirganan ve dihatin bikar anîn, ji ber ku pereyên me'denî yên kevin tê de dihatin dîtin.

Jêderên dîrokî dibêjin jî, li derdora sedsala çardehên zayînê, li cihê pira niha, pireke bi navê ((pira Qîbar)) hebû û keloşkeke bi navê xwediyê wê ((Elî Qîbar)) li bakur rojavayê gundê Qîbarê hebû, hîn jî şûnwarên wê hene.

Di serdema Osmaniyan de, bi taybetî li dawiya wê, riya di navbera Heleb û Iskenderonê de, di ser piraya Efrînê re derbas Hemamê û 'Entekê dibû. Loma jî gelek xanên bazirganan li hêla kendalê çêm ya rojava hebûn, hinek jê ta wan salê dawîn mabûn.

Piştî cenga Seferbêrlikê "şerê cîhanî yê yekê", sînorên nuh li rojhilata navîn hatin danîn, sînorek jê di nîvê navça Çiyayê Kurmênc re derbas bû û ew kir du perçe. Wî sînorî bajarê Kilisê wekî ku navenda navça Çiyayê Kurmênc bû, li aliyê Tirkiyê hêşt. Ji ber wê yekê jî, Firensiyan pilan kirin ku navendeke şaredarî li perçê Ç.Kurmênc ê başûr, ê ku dibin destê wan de mabû ava bikin. Wê hîngê rabûn cihê bajarê Efrînê yê niha li kêleka pirê ((Kopriyê)) vebjartin û avahiyên destlatdariya xwe lê girtin. Wê lomê jî, di nav gel de, ta van salên dawîn navê ((Kopriyê)) li şûna navê Efrînê bikar dihat.

Li dema me, bajarê Efrînê ji van taxan (kuçeyan) pêk tê:

www.arsivakurdi.org

- Bajarê kevin:

Me li jor goti bû, berî sala 1920 an, tenê çend xan li ber pirê hebûn. Di sala 1925an de, Firensiyan dest bi avakirina avahiyên destlatdariyê kirin. Kesên ku nexşeya bajar Efrînê danîne du Endezyarên Ferensî bi navên ((Îkoşar û Boncê)) bûn, wan ew nexşe li mûdêla bajarên Romanî yên ku kolanên wan xaçî û rast in danî bûn.

Di sala 1923an de, dest bi avakirina baregeha polîsan, zîndan û serayê kirin, û li dawiya sala 1925an, an destpêka 1926 an ew bidawî bûn.

Li sala 1927an dibistana seretayî jî hat vekirin. Pişt re kolana "Riya Hemamê" hate qelaştin û li herdu aliyên wê dukan û xanên kirînfirotanê yên biçûk hatin vekirin, ji bilî wan du ûtêl jî hatin avakirin.

Wê hîngê nivîsgehên kutikê nifûsê, maliyê, îfta hatin damezrandin û gelek tiştên xizmetgûzarî yên din jî hatin bicihanîn.

Rûniştvanên Efrînê yên destpêkê Ermen bûn. Ew ji dest zordariya serbazên dewleta Tirk li baregehên hêzên Ferensî dihêwirîn. Pişt re, hin Axeyên Çi.Kurmên hatin xanî lê avakirin û rûniştin. Wek malên: Seydê Mîmê, Robarî, Ehmedê Xelîl, Şêx Sim'el, navdarê Êzdiyan ê wê demê Dewrêşê Şemo û ji bilî wan jî hebûn.

Li destpêkê, li gor peymana ku Ferensiyan bi rêberên Kurdan re mor kiri bûn, wan rêvebirên kargêrî ji navçêr e şêniyê navçê danîn. Mîna (malmidûr, nifûs, serokê şaredariyê, polîs..), lewre ew hemî Kurd bûn û ji herêmê bûn.

Ta dawiya dehsala şêstî ji sedsala bîstan, Efrîn bajarokekî biçûk bû, xaniyên wê bi rengekî lihevhatî û xweşik li qontara girê Efrînê belav dibûn. Hemî xaniyên wê yên destpêkê bi keviran û axê hati bûn avakirin, serban jî dîrak bûn.

Pişt re, gelek şêniyên gundan ên bê erd û zevî hatin lê rûniştin. Loma jî bajar zû mezin bû û gelek kuçeyên nû û mezin çêbûn. Ew kuçe li ser zimanê xelkê bi van navan tên nasîn:

- Kuçeya Mehmûdiyê:

Bi navê Mehmûdê Qedîbil Ban hatiye binav kirin. Wî li destpêka dehsala heftan ji sedsala bîstan xaniyek li wir avakir û lê rûnişt. Kuçe li bakur rojavay bajêr e, malên

www.arsivakurdi.org

wê li ser hedu aliyên riya Reco belav bûne.

- **Kuçeya Zêdiyê:**

Ew gundekî kevin e, li ser navê pîrozgeha (Şêx Zêd) ya ku li ser sirta Xemrevînê ye. Piştî ku bajar li jêr av bû, gundê Zêdiyê vala bû û hemî xelkê wê daketin li nava bajêr mal ava kirin. Pişt re, gava bajar hîn fereh bû, malên wê gihîştin Zêdiyê, jê derbas bûn û gihîştin serê sirta Xemrevên.

- **Kuçeya Eşrefiyê:**

Ew li rojheltî bajêr e. Li aliyê çemê Efrînê yê rojhilat e. Rûniştvanê wê yê yekê, Wehîdê Aşvan ji gundê Kefirbetrê bû. Di salên şêstî de ji sedsala bîstan, malek û aşekî li wir ava kirin û li wir rûnişt. Paşê xanî li dorê hatin ava kirin, û wilo hin bi hin bû kuçeke mezin. Xaniyên wê li ser rûyê rojava ji sirta ‘Ampêlkê belav bûne. Kuçe «kembera perîşaniyê» ye li dor bajarê Efrîn.

- **Kuçeya Qeracê Gênco:**

Kuçe li ser navê xudanê wê deverê ye. Navê wî Gêncoyê Ehmo bû. Niha kuçe bi navê (kuçya rêka Turindê) tê nasîn. Ji ber ku malên wê kuçeyê li ser rêka gundê Turindê ya berê hatine avakirin .

Mirovê yekê ku xanî li wir ava kir Horîkê kirîf bû, ew li navîna salên şêstî ji sedsala bîstan bû.

Ev kuçe li başûrê bajarê Efrînê ye. Xaniyên wê bi şêweyekî ne pilankirî li rûyê qerêc belav bûne. Kuçe fereh bûye gihîştiye gundê Turindê. Ew gund bi xwe jî ketiye taximê şaredariya Efrînê.

- **Kuça Bobena:**

Kuçeke biçûk e, li hêla bakur li ber çemê Ffrînê ye. Ew bi navê piraniya rûniştvanên wê yên ji hoza Bobenî ya Ereb bi nav bûye.

Efrîn bajarekî ciwan û şêrîn e. Heyama wê xweşik e. Şeqamên wê rast in. Çemê wê di nav re diherike. Ferhenga Xaknîgariya Sûrî li derbarî wê dibêje, ku ew xweşiktrîn bajaroke li Sûriyê.

Efrîn navend û motka aborî, kargêrî û civakî ye ji Çiyayê Kurmênc re. Ji dehsala dawiya sedsala bîstan de, alafeke avakirinê ye giring li Efrînê rabûye. Li herdu aliyên riya Reco û li rojavahay bajêr, avahiyên xweşk rabûne, gelek dukanên dewlemend jî lê hatin vekirin û bûye navenda bazirganiya bajêr.

Bazareke Efrînê ye rojane (soqil hal) heye, berhemên

www.arsivakurdi.org

çandinê û dewêr lê tên firotan. Ji bilî wê bazara Efrînê ya heftane ya çarşemê ya ku ji sala 1927an de heye jî berdewam e.

Çend karxaneyên bêrîn, sabûn, mekbezên zêtê û karxaneyên kelûpelên avakirin û xwarinê yên biçûk lê hene. Meyxana wê di sala 1927 an ava bûye.

Ji bilî wan, gelek karxeneyên necarî, hesinkarî û duruskirina alavên çandwerî û siwarbûnê jî hene.

Ji ber ku bi deh hezaran şêniyê Çiyayê Kurmênc li Helebê ciwar dibin, çûnhatineke xort û berdewan di navbera Efrînê û Helebê de heye.

Li gor texmîna şaredariya Efrînê, hejmara rûniştvanên bajêr di sala 2006an nêzîkî 84 hezar bûn.

Nizimtirîn bilindahiya cîgehê bajêr li ber pirê 190m e, û bilintirîn jî li serta Xemrevînê ye 392m in.

Bajarê Efrînê niha navenda navçeya Çiyayê Kurmênc e, heft dever (nahiye) û 363 gundên biçûk û mezin pêve girêday ne. li sala 2005 an serhejmara tavhiya navçeyê di kutikê nifûsê de gihabû 460000 mirov.

Devera navend ya Efrînê bi xwe jî, ji 56 gundan pêk tê. Serhejimara bajêr û gundên devera wê, li gor kutikê nifûsê ya dawiya 2005 an 137000 mirov bûn.

www.arsivakurd.org



« Efrîn û gundên devera wê »

www.arsivakurdi.org

Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî

Xebat û lêkolîna rêzimana Kurdî, xebateka ne hêsan e, dijwariya wê ji gelek sedeman hatiye, sedema yekemîn ew e ku kesên pispor di warê lêkolîna rêzimana Kurdî de pir hindikin û bi taybet yê zaravayê Kurmancî, belê sedema wê jî, ji rewşa rêzanî û rewşenbîrî ya Kurdî hatiye, lê wek ku kaniyên çiyayên bilind ziwa namînin, roj bi roj ji nav gelê Kurd kaniyên rweşenbîriyê zelal – zelal diherikin, û her ku rewşenbîrekî Kurd nameya xwe ya rewşenbîrî diyarî gelê xwe dike, ew dilê me xweş dike û em pê şad dibin.

Pirtûka ((Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî)) ya mamote û zimanzanê Kurd SAMÎ TAN e.

Mamoste Samî Tan rojnemevanekî Kurd e, mijar û berhemên wî di kovar û rojnameyên Kurdî de têne weşandin, ji bilî rojnamevaniyê, ew zimanzan û pisporekî zimanê Kurdî jî tê naskirin û ew xebata xwe bi zimanê xwe yê zikmak dinivîse.

Ew pirtûk di sala 2005 an de bi alîkariya Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê li çapxana Îmaj Matbaacilik hatiye çapkirin. Pelên wê ji pîvana orte ne / 20,5 – 14 / cm. Ew ji / 352 / rûpelan pêk hatiye.

Pir hêjaye ku her zimahezekî Kurd vê pirtûkê bixwîne û pirtûkxana xwe pê bixemlîne, ji ber ku ev pirtûk jêderek ji jêderên bingehîn e ji rêzimana Kurmancî re.

Di naveroka pirtûkê de navnîşanên qaling ev in :

- DENGZANÎ.
- CÎNAVK .
- HOKER (HEVALKAR).
- GIHANEK.
- JIMARNAV.
- DI LÊKERAN DE AVANÎ.
- DI LÊKERAN DE RAWE.
- RASTRNIVÎS.
- PEYVSAZÎ (MORFOLOJÎ).
- HEVALNAV (RENGDÊR).
- DAÇEK.
- BANEŞAN.
- LÊKER.
- RAYÊN LÊKERAN.
- HEVOKSAZÎ (SENTAKS).
- XALBENDÎ.

Di dawiya pirtûkê de ji rûpel /343- 352/ Ferhengoka Têgihên Rêzimanî hatiye danîn .

Mamoste Samî Tan di pêşgotina pirtûka xwe de dibêje:

www.arsivakurdi.org

Li ser pêşniyara hineke endamên desteya birêvebir, emê carna hin gotaran wek ji me re hatine belav bikin, mebest jê ew e , ku em hemî bi hev re fêrî şêweya nivîsandina durust bibin.

Min pêşî bi mebesta berfirekirina "waneyên rêzimanê Kurmancî" dest bi xebatê kir, lê paşê xebat ji wê çarçoveyê derket! rengekî nû girt. Di wê pirtûkê de mijar wane bi wane hatibûn amadekirin û di dawiya her mijarê de hîndarî hebûn. Xebat di çarçoveya pirtûkeke rêziman a kilasîk de bû, mijarên zimanzaniyê zêde li ber çavan nehatibûn girtin. Lewre jî min biryar da ku berhemeke cuda û berfirehtir amade bikim. Ev berhem ji wê çarçoveyê hatiye derxistin, pê re jî ew hîndariyên li dawiya mijaran hatine rakirin. Ev xebata li ber destên we, li ser çar stûnan hatiye avakirin: Dengzanî, peyvsazî, hevoksazî, û rastnivîs. Lewma jî me navê " Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî " li vê pirtûkê kir.

Gelê xwendevan û nivîskarên zimanê Kurmancî: Ev pirtûka ku me dayê nasîn pir û pir hêjaye ku were xwendin û di pirtûkxana we de jî were dîtin, ji ber ku jêdereke pir hêjaye ji aliyê rêzimana Kurmancî ve.

Li dawiyê gurzek silav ji mamosteyê hêja S.Tan re.

Her bijî pênûsa her rewşenbîrekî Kurd, ku xama pênûsa xwe di nivîsandina zimanê Kurdî de ziwa dike.

Merwan Berekat

Nûrî Dirsim ... **Bîranînek**

Belê … her û her tu xemxarê welatê xwe bûyî,
di seranserî jiyan xwe de, te bi ava kaniyên Kurdistanê
gulçîçek avdikirin. Belê te jiyan di geşbûna lalên sor û zer û sipî de te didît ey gewreyê azadiyê.

Eger Çiyayên Dirsimê buxçikên dîroka xwe vedikin, bi dehan bûyerên sedê bîstan bi navê te hatine naskirin.

Belê ey şêrê roj û dema xwe, pakrewanê azadiya gel û welatê xwe, tu mayî û tu dê her bimînî yek ji pêşengên Kurdperweriyê di dîroka Kurdan de ey nemir Nûrî Dirsimî.

Belê… roja cejnê, Kurdên Efrînê tucarî te ji bîrnakin,
bi gurzên gulçîçekan gora te û ya hvaljiyana te wek bûk û zavan dixemlînin.

www.arsivakurdi.org

NIVÎSANDIN

Zamdarê Zindî

Dîrok berî dîrokê dest pê dike. Veguhastina bûyeran û terixandina wê dîrokek nuh çê dike(dîrok dîrokê çê dike) . Di van du biwêjeyên wate guvişti de mirov dikare dest pê bike. Dîroka heyberiya şanberî, berî ya zemînê dest pê dike, ew jî berî ya biyolîciyê dest pê dike...h.w.d

Aya bîrdoz, sîber û vêgeh berî peyvkirinê peyda bûne û dest pêkirine, piştî dengkirina devkî (serzarî) dîrokek gelek dirêj derbas bûye, û bi bandora nîr û heyamên dorhêlê û guhartinên wan yên berdewam û gerekiya dîrokî, nivîsandin hate afirandin û bi van rengan çê bû.

1- Nivîsandina bi tîpên mêxî, bi destê Someriyan .3500.B.Z li Mizopotamiye hatin afirandin.
2- Menewî li girava Kirîtê.2000 - 1000 B.Z.
3- Mêsînî li Girîkê 1400 - 1100 B.Z
4- Hîroglafî li Misrê Feroniyan pê dinivisandin 2000 B.Z
5- Lîneyer, Endosî, li Cînê
6- Meyenî û Estîkî, Hindên sor
7- Melemî, Mêlokî, Sîrîlî, Ogerêtî...H.W.D.

Weke hatiye naskirin, zimanên cîhanê dora /6075/ ziman bûn. Pir ji wan dêrisbûne, û niha /5400/ li ser riya dêrisbûnê ne. Ji berî /50-30/ hezar sal komelgeya mirovatiyê bi zimanê devkî daxêvî di hemî warên jiyana xwe ya rojane de pê diborand. Bi derengî dest bi nivîsandinê kir, ya herî kevin /6000/ sal in.

Rewşenbîriya nivîsandinê, li ser ya devkî avabûye, û çapemeniyê nivîsandin pêşde biriye û paristiye.

Karanîna zimên serzarî di rûyalê (jiwarî) de wê bi hêz û bedew dike, û bayexa hunerî ya peyvkirina mirovatiyê didê ye. Bê nivîsadin tu afirandin bedew û hêzdar peyda na bin û têgeha mirov na terîxêne. Ango serzarî bi nivîsandinê serî dibe, ziman jî xwe bi xwe şirove dike û giyanê afrandina gewre pêde ber dide...hwd. Nivîsandin bi sane zimanê dengkirinê vedigerîne yê berçav kirinê û têgehê carek din bi

www.pirsvakurdi.org

rengekî nuh ava dike. Tevî Evleton şerê nivîsandinê kirî, li ser zimanê Suqrat dibêje:" Nivîsndin tiştan derveyî mêjiyê mirov ava dike, karekî ne mirovene ye, ji ber ku bîranînê hildiweşîne ". Yên nivîsndinê bi kartînin gelek jibîrkirin. Ji ber ku pişta xwe bi tiştekî derveyî mêjî girê didin û jê re ewlekarin. Ango nivîsandin hişê mirov waze û jar dikin. Ji ber vê hin kesan şerê alavên hejmartinê kirine. Lê, nivîsndin carek din werdigere sezarî û bihîstokî, dîsa vedigere hest û nêrînên nuh çê dike û ramankirinê diguhêre.

Mirov dikare bêje, nivîsandin pêwîstiyeke dîrokî bû û hê ew pêwîstiya berdewame, ku mirov zanîn û daxwazên xwe biparêze, afirandina herî serke di şaristaniya mirov de bû.

Nivîs û Zarave:

Weke em dizanin ziman ji hemî peyvên wî miletî çê bûye. Aya her zaravek parek ji zimên e û ew bi temamî nikare bi bar û karê ziman dike pê rabe. Lê, gava zarav di nivîsandinê de bi kar tê û çap dibe, ya serzariyê (devkî) derbas dike. Xurtibûn û pêşketinê dide wê zaravê. Zimanê bi hemî zaravan tê nivîsandin, bêtir xurt, fireh û dewlemendtir e. Bi hêsanî hevok û derbirînên hizirê ronahî dike. Mîna zimanzan dibêjin "Tu zarav ji yê din çêtir tunene, ne rêzmana xwejî, ji yên din durist û rastirin. Di vir de giringe hemî bjeyên di zaravekê de hene û di yên din de tunene, di nivîsandinê de bi kar bên, ku kelepûra wî zimanî bête vejandin û toz û talaza demê lêgirtî ramale û zimênê nivîsandinê yê netewî ji hemî bêjeyên zaravan çê bibin. Lê, li ba hin miletan zaravek bêtirî ya din, di nivîsandinê de bi kar hatiye û serdestiya wê kiriye. Ew jî, li gor nîr û demên wê zaravê di warên (diravî, rewşenbîrî, olî, mewdanî, raghandinî, civakî û konevanî) re derbas bûne. Li hêla din gelek zarav di nivîsandinê de pêşketine, şûna zarvên din girtine, jê zimanê nivîsandina netewî derketine.

Weke zimanê Almanî, ji zaravên çiya yê bilnd li başûr çê bûye, yê Inglîzî ji zarava çîna bilnd çê bûye, yê Italî ji zarava tuskene çê bûye û ev zarav jî, ji gelek zaravan çê bûye. Li gor van serpêhatên şaristanî, yên gelên pêşketî, divê di tenga nivîsandinê re, em kurd sûdê jê werbigirin. Aya dema dîrokî ya gelê kurd têde dijî û zimanê xwe yê nivîsandinê hê ne bûye yek û yê dewletê û pêş ne ketiye. Divê berê hemî daner, rewşenbîr û dezgeh û sazeyên rewşenbîrî, ragundinê, fêrkirinê, mewdanî (aborî),... kurdan li nivîsandina yek be, yê hemî bêjeyên zaravên zimênê kurdî (soranî, kurmancî, zazakî...H.W.D.) di

www.arsivekurdi.org

nivîsandinê de bi kar wînin û di ferhengan kevin; ji ber ku hê zimanê kurdî di astngê de ye û girêk li ber pir in, rewşa wî ji ya gel e.

Li van rojan babeta standarkirina zimanê kurdî ji hêla hin rewşenbîrên herdu zaravan ve (kurmancî, soranî) bi zarevekê were nivîsandin, tê axaftin û devjengkirin. Hin deng doza serkeftina bi zarava soranî dikin û hinên din jî, ji zarava kurmancî li wê dozkirinê vedigerînin.

Berî mirov doza standartiya nivîsandina bi zaravekê bike. Çi soranî an kumancî yan jî dombilî (zazakî) be, an jî hersê zaravan li nav hev bixin be, jê zimanekî yek (standarkirî) çê bikin. Divê rewş û rola dîrokî ya her zaravekê di şaritaniya nivîsandina zimanê de çî ye binasin û hejmara yên pê dipeyvin çiqasin, belavbûna wan ya cirafî li ku ne, daxwaza wan ji standarkirinê çî ye û çiqas ji sedî miletê kurd li seran serî kurdistanê û derve zanin bi zaravên xwe bixwînin û binivsînin, ta nêrîn û vîna xwe di vê babetê de bidin û çiqas lêkolînên zanistî li ser her zaravekê hatine kirin, ku şûna zimanê kurdî bi kar were, ka dezgeh û sazeyên zamanzanî, rewşenbîrî, ragihandinê, aborî, fêkirin û perwedeyê,... ku wê biyara rast û durist û berjewendiya zimên bête birin ku werbigirin? Ta ew biryar di roja îro de bête wergitin ma kar û zirara wê yê çi be ? Ma kesên bi zaravên din dipeyvin wê zarava erê bûye re wê jê têgedar bin ? Mînak li ber çavên me ne Tilvizyonên bernamyên xwe bi soranî pêşkêş dikin, bînerên bi zarava kurmancî û zazakî dipeyvin piraniya wan jê têgehdar nabin û vajayî wê yên bi soranî jî dipeyvin weha ne. Ma standarkirina nivîsandinê bi darê zorê û dev avêtina rewşenbîrên zarava din û nizimkirina wan tê kirin ?

Ev nêrînên bi rengê pirsan me dane xuya kirin, jê re bersivên ruyalî (jiwarî) gerekin, û her perçakî kurdistanê mafên xwe yên konevanî û rewşenbîrî... werbigirin û civaka kurdî li wir pêşkeve dê bersivên wan pirsan bidin. Berî em xwe têxin wan devjengên berî dema xwe, aya em ji jor ve dest pê bikin û dakevin. Divê standarkirina alfabêyê û rênivîsê berî ya zaravan dest pê bike. - Em tev dizanin ta roja îro bi du alfabê û rênivîsan tê nivîsandin (ya latînî û ya erebî)- Gelê kurd bi yek reng tîp binivisîne û ji rewşa ne nivîsandinê (kewdenî) derkeve di ya fêrkirinê keve, bergeh û fiqaqî çê bibe, ji lêkolîn û lêgerinên zimên li ser hemî zaravan werin kirin û bêjeyên hemî zaravan di ferhengan kevin û ji hêla hemî rêxistin, dezgeh sazeyan ve bikar werin. Ku rê li ber nivîsandina bi zimanekî û rênivîsekê - ne bi zaravekê - dûz bibe.

www.arsivakurdi.org

Li vir miletê Ereb û Faris û dewletên wan dê bixwazin nivîsandana kurdan bi tîpên erebî bin. Ji ber kîjan nêrînê ûştê bin (olî, şaristanî, nijadî, nişţimanî, ciyopolotîkî…). Ji ber ku, em jê bi dûr ne kevin û di bin rewşenbîriya wan de bimînin. Li hêla din ji ber wan sedeman û hinên din, Turk jî dê bixwazin Kurd bi tîpên latînî binvisînin.

Miletên em vê re dijîn, ji hêla xwe ve her yek dê bixwaze, em bi tîpên ew pê dinêvisînin, em jî bi yên wan binivisînin. Ew daxwazana dê sersedemek din be ji gelşên miletê kurd. Ji ber ku niha goftûgo li ser serdestkirina zaravekê dikin, dê siba weha jî du aliyê çê bibin, hinê piştgiriya alfabêya latînî bikin û yên din jî piştgiriya alfabêya erebî bikin.

Ji niha ve ez yek xwe piştgirya nivisîna bi tîpên latîn dibînim ji ber ku gelek pêwîste kurd tev bi tîpên latînî binivisînin, ji ber hin sedeman.

1-Tîpên latînî dengdarên zimanê kurdî baş û zelal û nerim di nivîsandinê û lêvkirinê de bi sane kartînin. Aya ji hêla fontîkê ve tîpên latînî baş lê tên

2- Peyv ji hev jêna be.

3- Piraniya gelê kurd pê dinivisînin.

4- Tîpên latînî dê miletê pê şaristaniya nûjen ya bi wan çê bûye û çê dibe ve girêde û havil û sûdê zû jê werbigere.

Jêder:

1- kovara -Alem El me'rîfe-Hejmar-182.El şîfehiyê we elkîtebiyê. Waltirc Onc-wergêr:Dr.Hesen El bene Izdîn.

2- Rojnama el be;s.



www.arsivakurdi.org

Çalakiyên desteya birêvebir

Di nîvê diduyê de ji sala 2007an, desteya kovar me PIRS digel kovar û rojnameyên Kurdî li Sûryê bi çend çalakiyan rabû.

- Ji bona biryara dadgeha Îslamî li Êranê, bi dardekirina herdu rojnamevanên Kurd ji Kurdistana Rojhilata, Ednan Hesenpûr û Ebdulwahid Bûtîmar(Hîwa), li roja 31.08.2007 Kvarên Aso, Gulistan, Gelawêj, Jîn, Pirs, Perwan, Roj, Vîn. Û weşanên: Ziman, Deng, Newroz. bangek belav kirin, tê de biryara biderdekirinê şermezarkirina û daxwaza serbestberdana wan kirin û wiha gotin: ((Em kovar û weşanên bi zimanê Kurdî yên li Sûriyê derdikevin, vê biryara hovane ya derheqa herdu rewşenbîr û tekoşerên Kurd şermezar û riswa dikin, bang li hemî dezgehên mafên mirovan, raya gîştî ya cîhanê, hezkirên azadiya mirovan, hezkirên peyva azad dikin, ku li dijî vê biryara ne mirovane serî hildin û ji bo serbestkirina wan têbikoşin)).

- Bi boneya goçkirina nivîskarê Kurd Mihemed Uzun, Kovar û belavokên Kurdî: Aso, Deng, Gelawêj, Gulîstan, Jîn, Newroz, Perwan, Pirs, Roj,Vîn, Komîta Ziman û çalakiyên Kurdewarî, li 11.10.2007 Nameke Sersaxiyê ye hevbeş belavkirin û xemgîniya xwe diyar kirin, di namê wiha hati bû: ((Bi navê kovar, nivîser û xwênerên wan, bi navê hemî rewşenbîrên Kurd li Binxetê, em sersaxî û serxweşiya malî, malbat, dost, heval, dezgehên rewşenbîr û rewşenbîriya Kurd li welêt û derveyî welêt, bi koçkirina rewşenbîr û romannivîsê Kurd ê nemir Mihemed Uzun dikin)).

- Bi helkeftina 23yemîn salvegera koçkirina Seydayê CEGERXWÎN, Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê, ahengeke rewşenbîrî, êvara 22.10.007 an, li ser gora nemir CEGERXWÎN li bajarê **Qamişlo** li dar xist. Û di 26.10.2007an daxuyaniyek jî, li derbarî wê ahengê weşand û got: ((..Ev karê me yê hevbeş, rêzgirtin û rûmeteke taybet û berbiçav li nik rewşenbîrên me yên xoşewîst dibîne. Di vî warî de, em hêvîdar in ku di paşerojê de, ji bo pêşvebirin û geşkirina rewşenbîriya kurdî li Sûriyê, em ê di asta hêvî û baweriyên wan de bin..)).

www.arsivakurdi.org